

# WELAT

Li gorî şarezayê DPT (Rêxistina Plansaziyê ya Tirkiyeyê) pêkhatirî ve  
yekê girêdayî baweriyê qederperestiyê ye. Lî heman şarezâ dike  
zanîn ku digel ku gelê Kurdistanê bêhtir girêdayî baweriyâ qederper-  
estiyê ye ji, li Kurdistanê nîşaneyên 'teqîneke girseyî' xwe dane klar.



**Li gorî DPT'ê  
Kurdistan li ber teqînê ye**

RÜPEL 3

Hevpeyvin li gel gerînendeyê Giştî yê Ülkede Gündemê Erdem Önal: "Rejîm tevahiya  
hêz û kesen muxalîf ji xwe re neyar dibîne" RÜPEL 8-9

Zulkûf Kışanak li ser şêhîd İzzettin Görnû nivîsand "Piyê şêhîdan şêhîd  
İzzettin Görnû" RÜPEL 6

Mîrhem Yiğit "Hikûmet termometreya dewletê ye" RÜPEL 7



A. Şengal: Heke bawernameya we ya zinamê kurdî hebe, hûnê bibine mamoste



Servet Yükselir: Bineşşa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî - v-



Azad Altun: Ji welêt du lîstikên watedar

## Ji Xwendevanan

**MERHEBA** xebatkarén rûmeté, di vê ger mahiya haviné de em ji hênikahiya dilê xwe ji we re silavên xwe dişinîn. Di rojnameya vê hefteyê de nivisa ku me ji we re sandibû hatibû weşandin. Ji këfa, me nikaribû xwe bigirta, di nava van çar dîwarên girtigehê de li vê dera sar. Dil û mêjîye me ji këfa bû wekî bilbileki û berê xwe da çiyayê Kurdistanê, teví refen ARGK'ê bû. Hevalê min Büllent seba ku ew hê nû hînî xwendina zimanê me dibe, inca ku navê wî jî derketibû ji këfa tebatî nedihatê. Pirtûka Osman Aytar "Kurdistana bi fîftî fîftî" jî ji me re hat. Em geleka spas dikan. Emê wekî çavê xwe biparézin. Hûn mirovén hêja li xwe baş binérin.

MURAT ASLANHAN-BÜLLENT ŞİŞKİN

**XEBATKAREN** birêz, ji ber ku hûn di bin mercen giran de li Tirkîyê rojnameyeke bi zimanê me yê neteweyî derdixin em sillayê xwe yê bê dawî ji we re dişinîn. Pêwist e gelê me qîmeta 'Azadiya Welat' bizanibe bixwine û bide xwendin. Em tev dizanîn kû derxistina weşaneke bi kurdî û bê derew li Tirkîyê ne hêsan e û bi qelenê giranbuha tê derxistin. Ez dixwazim tiştîk pêşniyazi we bikim. Ez kebanî me. Ez bawer im ger hûn di quncîkekî de tarîfê xwarinan biweşinîn wê çêtir bala kebaniyan bikişine.

Ez bi gotineke Apê Ho dawiyê li nameya xwe tînim. "Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştîk nîn e, ger mirov ji dil xebatê neke, wê her dem barê bindestiyê bikişine."

SOZDAR BÊMAL/TARSUS

7

10

11

## Hikûmeta MGK'ê û azadiya derbirina ramanan

SAMI TAN

Kes nizane ci bi çapemeniya ku şirîkên hikûmeta berê jê re dibêjin "çapemeniya kartel" hat. Ji nişka ve rojnameger û rewşenbîrên di girtigehan de hatin bîra wan. Dema mirov bala xwe di de van nîqaş û nîvîsîn li ser serbestiya derbirinê, bîvê nevê nirxandinê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan tên bîra mirov. Li gorî van nirxandinan artêş rastast dest diavêje polîtikayê û bi metodên ji yên berê cûdatir li piştgiriya gel digere. Di heman nirxandinan de daxistina hikûmeta Refahyol wekî tasfiyekirina çeteyê Çillerê tê binavkirin. Wisa xuyaye ku artêş wê berstûka malbata Çillerê bi hêsanî bernede, li aliye kî nîqaşen li ser azadiya çapemenî û derbirinê gur dîbin, li aliye din qala darizandina Tansu Çillerê tê ki-ri.

Ev nîqaşa li ser çapemeniyê ne tenê bi hikûmeta MGK'ê û artêş vê girêdahî ye, hînek sedemên din jî hene. Yek ji wan sedeman hatina heyeta Komîteya Nâvnete-veyî ya Parastina Rojnamegeren e. Jixwe vê rîexistinê û hînek rîexistinê din ji demeke dirêj ve ye ku ji bo azadiya hînek rojnameger û rewşenbîran kampanya da ye destpêkirin û çalakiyan pêk tîne. Heyeta vê rîexistinê bi avabûna hikûmeta nû

re hat Tirkîyê û ji rayedarên tirk berdanna rojnameger û rewşenbîrên girtî xwest. Rayederen tirk wekî hikûmeten berê helwesteke şirogermî nîşan dan, heta hînekan qala azadiya Mamosta Beşikçi kir. Li gorî nirxandina rojnamegeren di nava heyetê de helwesta rayedarên tirk zêde hêviyê nade. Belkî efûyeke bişînor a ji bo berpirsîn karê nîvîsaran a rojnameyan derkeve, lê ew jî birînê derman nake, lewre bi sedan rewşenbîrên ku ji ber xâlîn cur bi cur ên qanûnê antî-demokratik hatine girtin, hene.

Li vir taktîke rayedarên dewletê bâlî dikişîne, dewlet dixwaze hin kesen ku bûne sembol, wekî İsmail Beşikçi, Eşber Yağmurdereli, Işık Yurtçu bi efûyên taybet berde û devê vê mijarê bigire. Lê ji ber ku ew kes vê yekê napejîrinin, ev bi taktîk bi ser nakeve.

Sedemekê din a vê helwestê jî endamîya Yekîtiya Ewrûpayê ye. Tê gotin ku navê Tirkîyê di nava listeya welatên ku wê heta sala 2003'yan bibin endamên yekîtiyê de tuneye. Rayedarên yekîtiyê wê bi Tirkîyê re-civîneke taybet pêk bînîn û di vê civînê de wê kîşeya kurd û mafêni mirovan wekî astengên sereke yên li ber endamîya Tirkîyê werin destnî-

şankirin. Ji ber vê yekê hînek nîvîskar avêtina hin gavê berbiçav dixwazin.

Divê mirov yekalî li rewşê nenihêri, lewre vê navberê de hin tiştîn din jî diqe-wimîn. Cendirme li ber çavên rojnamegeren lêdanek hovane li girtiyê Girtîgeha Metrisê dikan. Bi vê yekê jî didin zanîn ku tu ferqê naxin nava gelê kurd û tirk. Her wiha artêşâ ku dev ji Tansu Çiller û Meral Akşenerê bernade, Cîgirê Gerîn-deyê Şaxa İstixbaratê yê Emniyetê Bülent Orakoğlu davêje hundir, li ser agahîyên ku Hanefi Avcı li ser Veli Küçük û endamîn çeteyê yên di nava artêşê de dide, qet ranaweste. Dîsa generalen tirk qet guhê xwe nadîn agahîyên li ser kontr-ge-rîla Yeşil (Mahmut Yıldırım) ku li gorî Avcı tevkijiya taxa Gaziyê bi destê wî pêk hatiye. Wî zilamî piştî daxuyaniyên Avcı telefonî rojnameya Yeni Ufuk kir û da zanîn ku wî hemû tiştî di bin fermana dewletê de ji bo dewletê kiriye. Jixwe li gorî rayedarê CHP'ê Sinan Yerlikaya jî, Yeşil ji serkaniya giştî fermanan digire.

Wekî encam divê mirov tu car ji bîr neke ku ew hikûmeta MGK'ê ye, ew hevkâriya "de facto" ya di-navbera artêşê û hînek çegirîn de jî divê ji holê bê rakirin. Pêwist e hezên demokratik rîxis-tibûna xwe xurt bikin. Li aliye kî divê azadiya derbirinê bê xwestin, li aliye din jî ew rî nedîn hin gavê li dijî mirovahîye wekî li girtigehâ bicikirina sistema hucreyan. Her wiha divê berî her tiştî ji hikûmeta nû bi şûn ve kişandina buhayê ku hate ser heftê bê xwestin.

## Pêlên Zapê, bi giyana 14'ê tîrmehê kurmê darê dixeniqîne

MEMED MEMEDÎ

Gava ku mirov dibêje Mezopotamya di cih de tiştî ku tê bîra mirov û tirkîniyê bi dilê mirov dixe, jiyan, azadi, biratî, wekhevî û dilşahî ye; dewlemendiya serer û binerd e. Tê de ji her rengê darê fêkîyên cur bi cur hene. Lê yê ku vê bihuşte dide jiyandin û xwîna azadiyê li her cihî belav dike Kurdistan e. Yanî dil, dilê bi buhişt Kurdistan e. Ji ber vê yekê jî yê ku dixwaze bihuşte bixe bin destê xwe, gerek e ku bibe desthilatdar li ser Kurdistanê.

Bêguman vê xweşî û dewlemendiye kir ku girêz ji devê hovan biherike. Gu-rê hov birçî, car caran ku fersend didîtin êrîş dibirin ser vî dilî. Lê dûvê xwe dixistin nav lingê xwe, dikirin kûze kûz û vedigeriyan. Di seranserî dîrokê de, pîkesen berxwedêr û gelek jî xayîn derketin. Lê mixabin ji bo demekê be jî serkeftin a xiyanetê bû. Vê rewşê jî dihişt ku bav û kalêne me bêjin "Kurmê darê ne ji darê be, dar narize."

Şitla azadiyê çawa ku serê xwe radi-kir, bahozek radibû û dixwest ku şitlê ji rehan ve hilbike. Ji ber vê yekê, her çar aliye şitlê xiste çemberekî. Lê dema ku bê çare ma, kurm xistin pêş xwe û dixwest bi vî awayî jî, şitlê ku ji nû ve şîn di-be ji holê rake.

Di vê operasyona dawiyê da jî, bi alîkariya canawarê mezin, êrîş kirin ser Zapê. Lî rîhê 14'ê tîrmehê lêdanek bû, li ser serê dijmin û hevkârên wî, iro jî gerîlayan bi hêza ku ji vî rîhî standine, lêdanek mezin, li dilê dijmin û hevalên wî xistin û hêlinâ xiyanetê parce dikan.

Li dijî vê helwesta ha, kulîlk û pelên sitlê û bin dirûşmeya "Xwe sipartîn di be xiyanetê, berxwedan û dîbe serkeftinê!" de serê xwe rakirin û bi vê serhildana li Zîndana Amedê ferma kurm rakin. Di 14'ê tîrmehê de pişt lê hat şikan-din. Dijminê hov teví welatfiroşan, dix-wastin ku zindanê ji partîyê re bikin goristan û ci hêzen xwe yên ku hebûn tev dane ser. Di vê operasyona dawiyê da jî, bi alîkariya canawarê mezin, êrîş kirin ser Zapê. Lî çawa ku rîhê 14'ê tîrmehê lêdanek bû, li ser serê dijmin û hevkârên wî, iro jî gerîlayan bi hêza ku ji vî rîhî standine, lêdanek mezin, li dilê dijmin û hevalên wî xistin û hêlinâ xiyanetê parce dikan.

Li Amedê çawa ku dijmin bi destê Şahin û Yıldırım "halanên serkeftinê" didan û digot: "Edî me şitil hişk kir." Bi vî awayî teví Mesûde kurm, xwe bi cihanê bide nîşan ku bi "ser ketî ye" û ew li her cihî "serdest e". Lî çawa ku livbazîya 14'ê tîrmehê xiyanet kuşt û gel li xwe vegerand, livbazîya zarokên Zapê

wekî lehiyê pêl bi pêl xiyanet ji ser axa welat paqîj dike û ber bi azadiyê ve di-meşe. Lewra 14'ê tîrmehê bingeh bû ji bo berxwedanê.

Serokê tevgera azadiyê, ji bo berxwedana zindanê wiha dibêje: "Berxwedantiya PKK'ê ya dîrokî di serî de di Zîndana Amedê de ye, wateya wê ya mezin di vir de ye. Şerî li vir bersivdayîna dîrokê ya hezar salî bi serkeftin esli û kefaret e. Gelê me piştî ku bi sedsalan winda kiribû li wir qezenc kiriye."

Di 14'ê tîrmehê de ferma xiyanetê hate rakirin û rîhê vê berxwedanê di sal-vegera xwe ya 15'an de bi lez didome li serê Ciyanê Zapê û li tevahiya Kurdistanê. Ji ber ku felsefeya jiyanê li Kurdistanê şer e. Şer jî berxwedanê dixwaze li Kurdistanê, berxwedanî jî mirovafî ye.

Cawa ku xiyanet li kela Amedê hate binerdi kirin, bi rîhê berxwedanê 14'ê tîrmehê, iro jî kurmê ku dara mirovahîye qul dikir, bi pêlên Zapê tê xeniqandin ku careke din serî raneke.



**HATE** diyarkirin ku PDK'ya ku 3 sal e ji bo parvekirina hatina bazinganiya sînor bi YNK'ê re şer dike, rojê nêzîkî milyonek dollarî hatinê ji xûgiya (xerac) sînor distîne. Der heqê vê yekê de berdevkê Kongreya Nelewi ya Iraqê (ANC) diyar kir ku PDK vê xeracê bi kûrê Saddam Huseyin Uday re parve dike. Her wiha berdevkê ANC dibêje ku serokatiya PDK'ê qismek ji hatina petrolê ya ku firotiye Tirkîyeyê ji daye rîveberiya Bexdayê. PDK ji aliyeke din ve ji her qamyona ku di sînor re derbas dibe, di bin navê baca xizmetê de xeracê digire. Rojê ji bilî 130 hezar dollarî baca xizmetê, PDK di traflîka petrolê de ji, serê lîtreyekê 2 sent xerac distîne.



**KOMİTEYA** Navneteweyî ya ji bo Parastina Rojnamevanan (CPJ) ku di nav endamên wê de kesen navdar mîna Peter Arnett û Terry Anderson ji hene, ji bo parastin û azadîya hevpîşeyen xwe yên girtî hate Tirkîyeyê. Vê heyetê raporeku tê de navê rojnamevanan ku di girtîgehan de ji heye dane rayedarên dewletê. Her wiha di raporê de tê diyarkirin ku li 24 welatan 185 nûcegihan, êdîtor û weşankar di girtîgehan de ne û ji vê hejmara 78 kes bi tenê li Tirkîyeyê girtî ne. Li hêla din heyeta CPJ'ê tevî heyeteke ku nivîskar Yaşar Kemal ji di nav de bû li Girtîgeha Sarayê rojnamevan Işik Yurt-ziyaret kir û xelata rîexistinê danê.

## NÜCE

# Li gorî DPT'ê Kurdistan li ber teqînê ye

Li gorî şarezayê DPT (Rêxistina Plansaziyê ya Tirkîyeyê) pêkhatina vê yekê girêdayî baweriya qederperestiyê ye. Lî, heman şareza didin zanîn ku digel ku gelê Kurdistanê bêhtir girêdayî baweriya qederperestiyê ye ji, li Kurdistanê nîşaneyên 'teqîneke girseyî' xwe dane der.

**G**elê Tirkîyeyê êdî bi tevger û helwestgirtina xwe baweriyan za-nistî ji pûç dike. Hefteya rabûri de nûcyeke Rojnameya Radikal de hat ragihandin ku, digel ku li gorî pîvanê navneteweyî li Tirkîyeyê şertîn "teqîneke girseyî" (kitlesel patlama) pêk hatine lê, ev teqîn pêk nayê.

Li gorî şarezayê DPT (Rêxistina Plansaziyê ya Tirkîyeyê) pêknehatina vê yekê girêdayî baweriya qederperestiyê ye. Lî, heman şareza didin zanîn ku digel ku gelê Kurdistanê bêhtir girêdayî baweriya qederperestiyê ye ji, li Kurdis-

tanê nîşaneyên 'teqîneke girseyî' xwe dane der.

Li gorî nûcyeke, di warê parvebûna dahatûyan (gelir) de, koma rajortirîn 11 caran ji koma herî jérîn dewlementir e. Dîsa tê ragihandin ku ji bo 'teqîneke girseyî' sînor 10 qat e. Di nûcyeke yê de tê da-xuyandin ku di rewseke bi vî rengî de pêknehatina 'teqîneke girseyî' ji bo rîveberên dewletê şansekî mezin e. Her wiha tê gotin ku rewşa kambax a Tanzanya, Kenya, Senegal, Panama û Şiliyê girêdayî bi awayekî ne dadiyane belavbûna dahatûyan e û Tirkîye di nav welatîn



navborî de tê hejmartin.

Ev nirxandin bûyera ku sala çûyî li Urdunê pêk hatîbû tinin bîra mirov. Balkêş e, li weletekî wekî Urdunê ku desthilatdariyeke zordar û otorîter heye gel (ku bêhtir dîndar e) li dijî zêdetir kirina buhayê nan serî hildabû. Bûyerên heman rengî li welatîn wekî Misir, Tunus û Fasê ji pêk hatibûn. Li ser sedemên vê yekê Rektörê Zanîngeha Azad û Ronakbirê Sosyalist Fikret Başkaya pêşin da zanîn ku ev pîvan zêde ne zanistî ne, piştre wî got ku, divê rewşa welatîn Amerîkaya Latîf û Tirkîyeyê bê rûberkirin. Başkaya ji bo bêdengiya gelê Tirkîyeyê ji bal kişand ser nebûna çanda demokratik a Tirkîyeyê û got ku pêknehatina proleterbûneke rastîn ji vê bêdengiyê xurtir dike. Başkaya girêdayî vê yekê wiha got: "Gelê Tirkîyeyê tu caran bêyî dewletê tiştek nekirî. Her dem li hêviya dewletê maye. Lî, dîsa ji divê mirov bêhevî nebe. Mercen her welatî xweser in." Ji aliyeke din ve Mamosteyê Zanîngeha Boğaziçiye Aborîzan Naîl Satîlgan der barê pêknehatina 'teqîneke girseyî' de bi taybeti li ser hebûna metodîn aşkirina dijberiya gel rawestiya. Satîlgan mînaka partiya refahî da û diyar kir ku hêrs û dijberiya gel bi rîxistinê wekî RP hatîye haskirin, ji ber vê yekê 'teqîneke girseyî' pêk nayê. Ronakbirê sosyalist wekî sedemeke din ji hebûna mafêñ wekî mitîng û meşan da û got ku bi vê yekê hêrsa gel dadikeve û 'teqînê girseyî' pêk nayê.

Bi rastî ji digel vê rewşa kambax bêdengiya gelê Tirkîyeyê ya ji bo "şerî qirêjî" balkêş e. A balkêş, êdî saziyên ku

aligiriya îdeolojiya fermî dîkin ji rewşa kambax a Kurdistanê li xwe datîn. Bo nimûne Serokê TESEV Can Peker di meha gulana borî de di 'lûtkeya stratejiyîn berbendkirina xizaniyê' de li ser rewşa Amedê wiha gotibû: "Di rojîn pêsiya me de dîmenê xizaniyê yên Diyarbekirê wê bibin pirsgirêka herî mezin a Tirkîyeyê"

Her wiha nirxandinê şarezayê DPT'ê ji rewşa kambax a Kurdistanê diselmin. Gelo gelê Tirkîyeyê bi vê bêdengiya xwe piştgiriya "şerî qirêjî" dike? Li ser vê mijarê her çiqas nivîskarê İslâmî Yaşar Kaplan got ku gelê Tirkîyeyê li ser rewşê ne agahdar e ji, ji layekî din ve Fikret Başkaya daxuyand ku her çend bi awayekî zanayî nebe ji gelê Tirkîyeyê bi helwestgirtina xwe "şerî qirêjî" pesend dike. Başkaya di dûmâhîka axaftina xwe de wiha axivî: "Gelê Tirkîyeyê tê negîhiştiye ku rizgariya wî girêdayî gelê kurd e." Lî, hi ser heman babetê Aborîzan Naîl Satîlgan da zanîn ku têkiliya bêdengî û piştgiriya şerî qirêjî pir kêm e. Mamosteyê Zanîngeha Boğaziçiye, bal kişand ser bêdengiyâ kurdan a li hemberî birçitî û xizaniyê ji û bo nimûne ji rewşa kambax a Amedê bi bîr xist.

Li ser nirxandinê DPT yê der barê Kurdistanê de ji digel ku Fikret Başkaya got jixwe li wê derê mercen ser hene û gel li ser piyan e. Naîl Satîlgan bal kişand ser tekûznebûna nirxandin û daxuyand ku şarezayê DPT'ê nikarin hînî vê rewşê bibin, ev nirxadineke kêm e.

**Nivîskarê İslâmî Yaşar Kaplan**

## Kesên ku Tirkîye kirine vê rewşê dixwazin ew tim şerpeze bimîne

*Ma bi rastî ji bêdengiya gelê Tirkîyeyê girêdayî qederperestiyê ye?*

● Bi tenê ne girêdayî qederperestiyê (kadercilik) ye. Ev nirxadineke çewt e. Li holê girseyeke ku nîzane qeder û qederpereti ci ye, heye. Sedema bingehîn a vê bêdengiyê bandora leşkerî ye. Li Tirkîyeyê gel bi tiştekî nayê hesibandin, wekî mîhan tê dîtin û wekî mîhan ji tê çêrandin. Her tiş ji vir tê! Jixwe li Tirkîyeyê di pergala artêşê de ji ev yek heye. Dewlet bi mîlyonan mirovan leşkeriyê dide kirin û wekî 'küçikîn Pavlov' hîni gotina "bi fermîne fermandarê min!" dike. Pişti vê pêvajoyê mirovê li dijî dewletê bêdeng dimînin û wekî mîhan xwe dispîrîn dewletê.

*Ma gelê Tirkîyeyê bi vê bêdengiya xwe bi şêweyekî sergirtî piştgiriya şer dike?*

● Gel bi awayekî baş û tekûz nîzane li Rojhîlat û Rojava ci diqe-wime. Lî, bi dîtin min çareserkirina kîşeya rojhîlatê başûr ew qas ne zor û dijwar e. Rê û metod diyar in. Lî belê, naxwazin çareser bikin. Ji ber ku çeteyê nav dewletê û li dervayî dewletê debara xwe bi vî şerî dîkin. Ev şer ji aliye aborî ve Tir-

kiyeyê dike tengasiyê. Lî, ku gel bi vê rewşê bihese ji nikare tiştekî bike. Ji ber ku bûye wekî pez!

*Baş e, ma ev bêdengî ji bo derûdren İslâmî ji ne rast e?*

● Rewşa İslamiyan hînekî cudatîr e. Berê ji herkesi bêhtir min li ser kîşeya rojhîlatê başûr dinîvîsand. Li ser vê mijarê gelek tiş hatin gotin û hatin nîvîsandin. Bi baweriya min, êdî dema nîvîsandin û axaftînê qedîya. Bi vî awayî tiştekî ku bê çereserkirin zêde nemaye. Bi tenê em dikarin bi desthilatdarbûnê, vê meseleyê çareser bikin. Lî, ji bo ku em nikarin rewşa heyî biguherînin, ne hewce ye ku em vê mijarê wekî benîst di devê xwe de bicûn! Bêdengiya derûdorîn İslâmî ji ber vê rewşê ye.

*Digel vê rewşa kambax û aloz, Tirkîye çawa li ser piyan dimîne?*

● Jixwe Tirkîye ne li ser piyan e! Tirkîye dixîsike, şerpeze bûye. Li ber mirinê ye. Lî, kesen ku Tirkîye kirine vê rewşa kambax nawxazin Tirkîyeyê bikujin. Ne dihîlin rabe ser xwe, ne ji dihîlin bimire! Ev hêz dixwazin Tirkîye her dem bi awayekî şerpeze bijî.

MAZLUM DİĞAN

Bavê Zubeyr Aydar Mele Evdileh Aydar:

# Dewlet bi çavê dijmin li me dinhêre

*Berî her tiştî em dixwazin we nas  
bikin, kî ye Mele Evdilleh?*

● Belê navê min Mele Evdilleh e. Malbata me bi xwe ji gundê Hutê yê Perwariya (Xesxer) Sêrtê ye. Ez 58 salî me. Wextê xelayê malbata me ji Botan koçî başûrê Kurdistanê dike, ez li Zaxoyê têm dinyayê. Di sala 1950'yî de ji bo xwendina medreseyê ez tevî mamê xwe derbasî Kurdistanâ Biçük (K. Surî) bûm. Li wê derê min salekê medreseyâ erebî xwend. Wê demê gelê me yê Başûrê Biçük, bi berhem û helbestên Cegerxwîn û xebata Osman Sebrî hişyar bûbû. Min para xwe ji vê yekê stand, ji ber ku ez gelekî di bin bandora (tesir) Seyda Cegerxwîn de mam. Wê demê min zanibû ku ez kurd im, gelê kurd heye û ev gel di bin zordestiya 4 zebaniyan de ye. Pişti 2 salan em ji Sûriyeyê ber bi bakurê Kurdistanê ve hatin û min xwendina xwe ya medreseyê li Cizîra Botan qedand. Herdem hebûna kurd û Kurdistanê di dilê min de dijî. Pişti zewaca xwe, min di sala 1958'an de li gundê Dêrawut ku li ser Dihê (Erûh) ye dest bi melatiyê kir.

Di vê salê de li gundê Dêrawut Zubeyr hate dinyayê. Piştre ez bûm melayê resmî li gundê Êrkendê ku li ser Perwariyê ye...

*Wekî tê zanîn, ev demeke dirêj e ku,  
erîş li ser malbata we kêm nabin. Êrî-  
şen wiha; kengê, bi ci awayî û çawa  
dest pê kir?*

● Pişti 12 rezberê dewletê êrîşen bêhejmar anîn ser malbata me. Di 21'ê çiriya pêşî de (sermawez) ez ji hêla hêzên dewletê ve hatim girtin, li Sêrtê meh û nîvekê ez di bin işkenceyên giran de mam, piştre ez şandim Dadgeha Amedê, lê ez hatim berdan. Di sala 1981'ê de di meha adarê de fermandarê Tugaya Sêrtê 2 car gazî min kir, xwest ku ez werim Sêrtê. Ez rabûm çûm, dîsa işkence, dîsa tadeyi. Daxwaza wan ji min ev bû: Divê min çekên ku di gund de hene û ev çek ên kîjan malbatê ne bigota. Lî belê min negot. Ez bi kuştinê tehdit kirim û ez berdam. Di 2'ye pûşpera vê salê de, hêzên dewletê avêtin ser gund. Dîsa wan ez xistim binçav, 2 meh işkenceyên bi cur li min

kirin, lê li vê derê jî min tu tişt negot. Heta min ifadeya xwe nexwend min imze nekir. Li Dadgeha Amedê ez hatim berdan, lê dema ez vegeiyam Sêrtê, ji işkenceyên giran ez bûm wekî mihiyekî çawa ku ji gorê derketibe. Di sala 1981'ê meha rezberê de, leşkerên qumando ji bo operasyonekê mezin ji deverên Batmanê û Sêrtê hatin herêma Garisan, gundê Êrkendê. Ji bili min û çend gundiyyê din hemû zilamên gund reviyan. Kesê ku di gund de mabûn civandin meydana gund. Qumandar yeko yeko navê me xwend û wiha got: "Çekênen we hene, wan çekan bînin." Ji min re jî gotin: 'Du çekêne te jî hene' Me hemûyan got: "Çekênen me qet tunene." Qamandar qayil nebû, got: "İlle hûnê çekan bînin." Çiqas me digot çekênen me tunene, işkenceyên giran bi me dikirin. Wekî çawa ku bikevin nav heywanan bi nav me ketin û tiştî nedîti anîn serê me. Hate merhaleyeke wisa ku gundi ji işkenceyên giran bê mecal man û rabûn çûn yeko yeko çekênen xwe anîn. Lî belê ez û gundiyyê me Mihemê Salih, me ev yek qebûl nekir û me got: "Hûn me

bikujin jî çekênen me tunene." Dîsa wekî gurên hov li me dixistr. Wê çaxê bira-yê Mihemê Salih got: "Birayê min nekujin, çeka wî heye, ezê herim bînim." Piştre çû anî û ez mam tenê. Dîtin ku ez tiştîkî nadim destê wan, ez li wê derê bêhiş xistim û rabûn çûn.

Ew erîş bi vî awayî heta sala 1982'yan ji berdewam kir. Piştre ez sîrgûn kirîm gundekî Niğdeyê, li binê Çiyyayê Toros. Li vê derê jî dev ji min bernedan. Di sala 1985'an de li herêma Garisan bûyerek di nav gerîla û gundiyyê Kevzînê ku alîkarî bi dewletê re dikirin de qewimî. Di vê bûyerê de 3 gundi hatin kuştin. Ji ber vê yekê hêzên dewletê ez ji Niğdeyê anîm Sêrtê. Bi sedema ku malbatên kesên ku hatine kuştin diyar kiribûn ku ji van kuştinan ez mesûl im, 2 meh ez li Sêrtê di bin işkenceyan de mam, lê pişti derketina min a dadgehê, ez hatim berdan. Pişti berdana min ez çûm Niğdeyê. Di sala 1986'an de, min tayîna xwe xwest iskenderûnê û ji wê salê heta iro ez jiyanâ xwe li wê derê (iskenderûn) diborînim.

*Ji ber ku hûn Bavê Zubeyr Aydar in nérîna gelê kurd û hêzên dewletê li we çawa ye?*

● Berê gava Zubeyr, biçûya devevêkê, an jî gava hinekan wî didîtin digotin: "Ev kurê Mele Evdillah e." lê iro ez dibînim ku gava ez diçim civatekê, ciyat ji hev re dibêje: 'Ev bavê Zubeyr Aydar e' Ji ber ku ez bavê Zubeyr im gelê me gelek qedir û qîmet didine min. Berê jî ji ber ku ez mele bûm, gelê me ji min hez dikir, lê vê gavê bêhtir ji min hez dikan.

Hêzên dewletê, wekî berê min nabin û naxîn işkenceyê, lê belê bi çavekî dijiminayî li min dinêrin, ez û malbata xwe herdem di bin çevderiya dewletê de ne. Lî em jî wekî gelê xwe, tu car nabin awaza dewletê.

*Em dibînin ku hûn iro di nava çalakiyên neteweyî de ne. Bi dîtinâ we serhildana gelê kurd iro di ci merhaleye de ye?*

● Ez dizanim û dibînim, ku gelê kurd iro ji xeweke hezarsalî hişyar bûye. Iro li Kurdistanê, li metrepôlên Tirkîyeyê, li welatên Rojava û dewletên dinyayê, gelê kurd li doza xwe bi dilovaniyeke xurt dibe xwedî. Em ci jin mîr, zarok û xort xwedîyê doza xwe ne.



Bavê Serokê Komîteya Rêveber a Parlementoya Kurdistanê Zubeyr Aydar, Mele Evdileh Aydar, bi xwe jî şoreşgerekê hêja ye. Mele Evdileh ji hêzên dewletê işkenceyên xedar dîtine, hê jî dewlet bi çavê dijminatiyê li wî-dinhêre, lê ew jî dev ji doza xwe bernade.

Em dinêrin ku dewleta tirk ew çend qetliam, zilm û zorî, şewitandin û talanan dike, lê li aliyê din jî gelê kurd roj bi roj berxwedan û serhildanê xwe berfi-rehtir dike. Ev jî dide xuyakirin ku, tu hêz nikare serhildana vî gelî ji holê rake.

Em jî dixwazin li Kurdistanê aşî bi cih bibe. Em ne heyrana şerê qirêj in. Rêberiya gelê kurd, herdem bang li deweleta tirk dike, lê belê Enqere ker û lal e. Lê em hêvîdar in, wê rojek were li Kurdistanê şer bi-sekine. Zilma tirkan di tu demê de neçûye serî. Di dema selçukiyan de jî wisa bû, di dema osmaniyan de jî û iro jî naçe serî.

Em dîsa dibêjin ku em bi wan re ne. Tu car em dev ji vê berxwendana birûmet bernadin.

### Hûn xebatên ji bo çand, ziman û dîroka kurdî çawa dibînin?

● Tu netewe û tu gel bê ziman, nabe. İro dewletê dinyayê bi zimanê xwe têne naskirin. Ez tim dibêjim, ziman tiştekî gelek pêwist e. Herdem em di mal de, bi malbata xwe re zimanê xwe bi kar tînin.

MED-TV di vî warî de ji bo gelê kurd tiştekî gelek giranbuha ye. Berê me li televizyon û radyoyêni biyaniyan temaşe û guhdarî dikir, dema behsa kurdan bihata kirin, ji me re tişte nebaş jî bîhata gotin kîfa me dihat, me digot: "Behsa me dike." lê iro televizyona me jî heye. Min di jiyanâ xwe de heta iro tiştekî bi vî awayî xweş nedîtibû. Piştî ku min li MED'ê temaşe kir, min xwe wekî xorhekî 14 salî dît. Şikir ji Xwedê re min rojêni wiha jî dîtin, êdî ez bimirim jî ne xema min e.

Ji ber ku hûn 'Seyda ne' hûn ibadetên meleyên ku icazet ji dewletê distînin û bi awayekî 'faşî' van ibadetan bikar tînin çawa dibînin?

● Wekî tê zanîn li herêma, Botanê têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê bi destê mela û feqeyêni kurd ên welatparêz dest pê kir û xurt bû. Dewlet piştî ku bi vê yekê hesiya, rabû melayen Kurdistanê tev girtin an jî kuştin, di şûna wan de melayen ku xwendina xwe di Îmam Xatiban de kirine û bi ramanêna faşist perwerde bûne, anîn xîstîn nava gund û bajarêni

Wekî çawa ku bikevin nav  
heywanan bi nav me ketin û  
tişten nedîfî anîn serê me.  
**Hate merhaleyeyeke wisa ku  
gundî ji işkenceyên giran bê  
mecal man û rabûn çûn yeko  
yeko çekêni xwe anîn. Lî belê  
ez û gundiye me Mihemê  
Salih, me ev yek qebûl nekir**

Kurdistanê. Ew mele di mizgeftan de qîr di-kin û dibêjin: "Ew gelê ku alîkarî dide terorîstan ermenî ne." Ew meleyen ku ji dewletê meas distînin û di bin tesîra dewletê de ne, imana wan kêm e. Baweriya wan kesan tune ye. Ji ber ku şexsiyeten wiha ji hêla dewletê ve hatine kirin.

Min 15 sal li Kurdistanê meletî kir, lî tu car min xutbe bi tirkî nexwend. Ji ber ku ez melayê resmî bûm û 27 salan min meletî kir tu car min xwe nexist bin tesîra dewletê. Her dem xutbeya roja ïnê, ji aliyê serokatiya diyanevê ve ji me re dihat şandin, lî belê gava min dixwend, min diguherî û tişte ku ji cemeatê re baş bû min digot, tişte nebaş min nedigot.

İcar ez dixwazim ji te bipirsim; kurdên ku hezar sal in misilman in kengê bûn ermenî û zanîna misilmantîyê wê kurdên ku bi salane di medreseyen îlmî de dixwînin dê bi me bîdin naskirin, an meleyen ku ji imam xatiben faşist derketine?

Seyda Gotineke we ya dawî heye an na?



● Belê heye. Gotina min a dawî ev e! Divê gelê kurd li zarokên xwe navê erebî û tirkî daneyin. Her dem di mala xwe de bi kurdî bipeyivin, bîr û baweriya xwe ji bîr nekin.

HEVPEYYVİN: SALIHÊ KEVIRBİRİ

## Efsaneyâ Dîjle

FAYSAL DAĞLI



Xumîniya Dîjleyê hê ji dûr ve ye, tê. Tîrêjîn rojê li ser çem wekî pêpelûkan direqisin. Dengê avê aramîyê dide mirîv. Wekî kilamekê bi aheng ji kûr ve distrê. Dîjle dema bajar dikeve xewa kûr, dest bi helbesta xwe dike. Awazîn Dîjleyê wekî ku ji dehîzîn dîrokê were, ji kûr ve tê. Çem dema digihîje bin siya kela bajêr dibetile. Bê hemdê xwe diherike. Mirov baş bala xwe ne de wê, mirov dibêje qey sekinî ye. Wekî porê narînekê di xew de, qey av mirov dibêje razaye. Lî ger mirov ji zimanê Dîjleyê fêm bike, wê bizanibe ku Dîjle bi Kela Diyarbekirê re dipeyive, jê re qala ser-pêhatiya xwe dike. Çem ji bajêr re rîwingiya xwe ya ku ji çiyayê Hazar û Şerafedîn dest pê dike, dibêje. Ji ber vê eşqê ye ku Dîjle ji ber ku di ber gelek bajaran re derbas dibe, lê yek jî wekî Diyarbekirê bi wê nasdar nayê,

her du wekî evîndarêñ hev in. Ji ber vê yekê, Dîjle ji qûma xwe, feyzâ mezin diyarî Amedê dike. Li tu derê qûma wî çemî zebeşê efsane-wî nade tu kesî, ji bilî mirovê ber Kela Diyarbekirê.

Kel, di cihê herî nêzîk de jî bi dehan metreyan di ser asta Dîjleyê re ye. Ew wekî xencereke tûj ber bi rojê ve diçê. Ev der birca Qralqizî ye. Zarokên Dîjleyê hîn jî bawer di-kin ku ji labîrentê Qralqizî qêrînê keçekê tê. Ew ji hev re efsaneyâ qîza qralê Diyarbekirê dibêjin. Li gorî vê efsaneyê wê keçê xwe ji bilindahiya bi dehan metreyî ya bircê berî ava Dîjleyê dabû.

Dîjle bengînê însanên vî bajarî ye jî. Zarokên Dîjle dibêjin ku, çem hersal gazî çend mirovan dike. Kesênu bi gaziya çem ve diçin, careke din nafetilin. Hemû havîna zarokên Dîjleyê, bi şîna mirovên ku bi gaziya avê ve çûbûn, derbas dibe. Çem wekî evîndarekî bi keser mirovê ku digire nav pêlêne xwe, êdî bernade. Piştî ku hesreta çem diqed, mirovê nav milêne xwe hêdika datîne bin lütkeyê ke-lê. Ew êdî laşekî bêcan e. Mirov rih û agirê. damarêne xwe berdayê nav avê. Heval û hogirêne wî bi xofeke mezin wê li Dîjleyê binêrin û li ber vê eşqê çok bişkînin. Piştî mirina

her mirovî di Dîjleyê de, zarokên çem çend rojan nakevin avê. Çermêne xwe bi dilopên avê şîl nakin. Çend rojan bi şûn de dîsa bi Dîjleyê re li hev tê. Ta ku av ji wan, yekî din jî ziwa bike:


Çem piştî vê cinayeta xwe, wekî zarokeki bi coş baz dide ber bi hedefa xwe. Hedefa wê bişta wendayî ye. Welatê pirtûkên pîroz e. Rêwingiyekî bê sînor e, ji nav rûpelên dîrokê diherike ber bi axir zeman.

Dîjle rîwingiya xwe didomîne. Lî dawîya hemû efsaneyâ heye. Hemû rî li cihekî bi dawî dibîn. Ew wekî qederekê ye, ku mirov nikare pê. Ev wekî zagoneke jîyanê ye. Rêwingiyâ Dîjle ji, efsaneyâ Dîjle jî ber bi qedandinê ve diçê. Bîhuşta wendayî, welatê pirtûkên pîroz, sîngâ Kurdistanâ azad e. Dîjle wekî Sîmûrg li xwe digere. Li azadiya pîroz digere. Azadî ber Dîjle ve dimeşe. Zarokên ku Dîjle tîna dilê wan dişikîne, iro, hêza hebûna xwe, xwîna xwe, diyarî axa xwe dikin. Xwîn ber bi Dîjleyê ve diherike. Xwîn wekî çemekî sor ber bi dîrokê ve dimeşe. Her du çem dema li welatê pîroz gihiştin hev, wê efsane biqedede. Wê bîhuşta wîndayî bê dîtin.

# Piyê şehîdan şehîd izzettin Görnû

**E**wo bandorkeran weşîna ma, winî kerda qilêrin ke, se serî raverê jî, iyê vîrî nêbê. Êke marê biyê, Viyetnam de, Cezayir de, Başûrê Afrîka de, Latîn Amerika de jî nêbiyê. Ê cayan de, tayn bo jî rûmetê lecî esto. Bandorkeran wexto ke, jew şoreşger yan jî jew welatperwer kiştê, ïnan rê vatê: ‘Ma jew Cezayirij, ma jew Afrîkayij, ma jew Sandinist kişt.’ Yan jî vatê: ‘Jew Cezayirij, jew Afrîkayij, jew Sandinist kişa.’ La belê badorkarê marê vanê: ‘Ma jew terorîst, jew çapulçî, û jew eşqiya kişt.’ Rewşê ma kurdan winawo û bol girano embaz.

**W**ayîrê nê qisan şehîde ma, şehîdê sûka Batmanî Ded ïzedîn bi. Mi Ded ïzedîn Adna de silasna bi. Rojê amê rojnama ke, qandê lacê xo, şehîd Ekrem Görnûyi ïlan bido. Ïlan ke, ey ard, ma piya wend û niwisê ci jî ma kerd rast. Peyra jî, ma heqê ïlanî sero qisey kerd. O roj mi, eyra disseyhezar perey waştî. Ded ïzedînî jî mi rê wina vat: ‘Mi de, sehezar esto. Ek şima şenê, sehezara nê ïlanî vejê, ek şima nêşenê vejê, ezo werzi şirî.’ O çax mi jî, eyrê vat: ‘Ti



AHMET GÖRNÜ


çiyê ne şehîdiyê? Wexto ke, pereyê wayirê şehîdî çinêbê, ma nêgenê.’ No fin Ded ïzedîn qahriya mira û wina vat: ‘To rê çiçî, ez çiyê şehîdiya? Ez şara û ważena ke, şehîdanê xo rê wayir vejî. Pereyê mi jî vêşî çinîyê, oyo se bo? Ek şima welatperweriyê, wayirê şehîdan rê paşî vejî. Wina bikrê ke wa şar şima ra dûrî nêkewê.’ Peyra jî, Ded ïzedîn werişt û şî. Ïlan jî xo de berd. Ma senî kerd jî, ey ïlan nêda. Rastî jî xo de xeylî şikiyabi. Çend rojî teypa ez kewta ey dim û çewtin xo raşt kirî. Çend rojî teypa mi şopê ey dî 0 jew Batmanij kewt mabendê ma û ma ardîm pêhetek. No maben de, embazê Batmanij o da

silasnayin. Bahdoyê na ziyaret, ma bî embazê pê û ma serde şiyê ameyê.

**D**ed ïzedîn Adna de, kê keyna xo de mendê. O neşayê şiro Batman. Çimkî a sük de, dewleta tirk, fermanê merdina ey, dê bî kontrayan. Kontray çend finî kewtî bi ci dim, la belê o her tim jî reya bi. Wexto ke, ma şarê Batmanî sero qisey kerdê, Ded ïzedînî vatê: ‘Şarê ma êsîr nêkewnê û nuwa teypa jî iyê êsîr nêkewê. Şarê mawo ewro qeçanê xo ya rûmet vîneno. Kam se vano wa vajo, no şar çareserê lecê reyayinê xo biyo. Ez ney xo de zana. Veriyê lecê gerîlan, ez ne welatperwer biya û ne jî şoreşger biya. Dûkana mi esto, erdê mi esto, hal û wextê mi rindo; la belê ezo ewro nêşena şirî welatê xo. Qandê çiçî? Çimkî mi dîna ke çimkewteya çiyê nîşo sere. Çiyê jî hendê xoserîn weş niyo. Ewro mayî bimrê, la belê mayê nê bandorkeran ra bireyê. Ez raya gerîlayê ma ra, xeylî bawerî kena.’ Wexto ke Ded ïzedînî qisey kerdê, guniya kesî girêyayê. O şeşti sere bi, la belê hendê jew ciwanî jî xo ser de bi. Wexto ke merdimî o diyê, ci ra quwet girotê.

**R**ojê ma lajê ci Şehîd Ekremî sero qisey kerd bi. Mi o roj ci rê wina pers kerd bi: ‘Ded ïzedîn ti piyê şehîdî yê, psîkolojîyê piyê şehîdan sero ti şenê se vajê?’ Mi ewna ke, riyê ci bi sip û sûr. Wexto ke, o sûr bi ez xo de lerziyewa. Çimkî mi zanayê ke, Verpers (cevap) na pirs, tayn tahde oyo bido ci. Ded ïzedînî xorî ra nefes girot û peyra jî wina vat: ‘Embaz ez to rî senî vajî. O ke ez zana, mesûliyetê piyê şehîdan zaf o. Baro ke milê ma sero de zaf giran o. Coka jî tim û tim ez kaxidê ney da. Jû jû fin embazî vanê, ti vêşî megeyre, heveyê bewne xo. Ti vaje embaz eza senî vindirî? Di lacê mi şehid kewtî û jew lacê mi jî işkencyê dijiminî de felç mend. Çend finî jî ez destê ïnan ra reyeya. Wexto ke şar vano piyê şehîdan yeno, piyê şehîdan şino zerya mi bena gird. O çax ez vana kes hendê mi kîfweş nêbeno. Raştî jî ez ïnan ra rûmet gena. Ïna şehidê Kurdistan heminê, fina jî piyê ïnan o. Lajê mi qandê welatê xo, qandê azadiya şarê xo û qandê mardimatey bî şehîdî. Zewbî ez torê se vajî embaz....’

**L**ajê ded ïzedînî yo gird Ahmet Görnû, wexto ke jew lecî de




IZZETTIN GÖRNÜ

şehid kewt, Garzan de femandarê artêşa reyayina şarê Kurdistanî bi. Lajê ci yo bîn, Ekrem Görnû jî sûka Batmanî de kontrayan şehîd vist. Ekrem kê xo de, jew welatperwer bi. Ded ïzedîn vatê: ‘Ahmed gerîla bi û dijimiya lec kerdê. Şahadetê Ahmedî yo, mi vêşî nêtewneno. La belê Ekrem winî niyo, o kêverê kê xo ver de xayinan şehîd vist. Coka jî ez zaf kewna ci ver. Bewn embaz lajê mi no werteyin jî, işkence de felc mend, ez nêkewna ey ver jî. Çimkî dijiminî ra heme ci yeno, se bikro jî minetê ci çiniyo.’ Ded ïzedîn wexto ke, qaçaxê xo serd de qisey kerdê, hendê zereyê jî sist nêbiyê. Û ey zerî dayê kesî. Min bi xo jî, ey ra zaf zerî girotê. La belê jû fin jî, xeftianê çewtinî sero vinderdê û zaf qahriyayê. O çax jî ey wina vatê: ‘Ma kotî ra ney heqî gînê ke, çiyê çewtin kenê? Wexto ke ma bes nêkenê, gerek ma embazanê xo ya bêrê pê ra binimnê, mayê vinî bikerê. A bîn jî ma mejbûrê ke, pê ra hez bikerê. Gerek ez to ra, ti ey ra, o ê bînî ra hez bikerô ke, ma piya biresê.’ Ey çend ke qisey kerdê, kîfî kesî ci ya ameyê. Çimkî Ded ïzedîn roşnîkarê şarî bi. Ey wastenê şarê ma winî weş ardê ziwan ke, çiyê jî çiman ver de vinî nêbiyê.

**E**mbazê mayê Stanbolî de Özgür Gündem girotî bi. A roj Ded ïzedîn jî, bi meymanê ma. Ê rojan de şar zaf şiyê ameyê. Çend ke, ma dest ra ameyê, boyina verpirsê şarî dayî. Pêriknan jî ma ra rojname waştî. A roj jew embazî ma rî wina vat: ‘Xeta

Özgür Gündemî reformîsta wa karkeranê ci nay bizanê. Ek fina winî biviyo, wendoxê fina megrê.’ Hewna mi verpirsê ê embazî nêdabi ke, Ded ïzedîn xo resna mi û wina vat: ‘Embaz to çend finî rojname erîna û ti çend finî şew ra rewî, şewreyen weriştê û şiyê dûkan ra girot? Verpirsê mi raşt bidi ke, ez tevayê vajî.’ Ê embazî wina vat: ‘Çi zana, jû jû fin mi girotê. Wexto ke, çiyê bibayê mi tim û tim erînayê.’ No fin Ded ïzedînî wina vat: ‘To dî embaz, wexto ke çiyê biyê to girotô.

**N**o nêbi, gerek ma her roj jî bigirê ke, embazanê roj-namegerî jî nê wastinê ma ra çiyê bigirê. Ma se kenê; ci ravêreno girwe qediyeno, ma vanê embaz ez na rewî ra nêweş a. Na raya ma çewta embazî mino delal. Na şoreşa kofti de ti sereyê ci veradê, oyo to dest ra bireyo. Raşt o, kemîna rojnamey esta. La belê ma nêşenê, nê kemiyan ra xo bireynê û vajê: ‘Özgür Gündem reformîsto mayê ay ra nêgem.’ O çax mi diyê ke, şoreşide zehmetê kamî vêşî esto, o merdim qiyimet dano xebatanê welatperweran. Nê merdiman ra jew jî Ded ïzedîn bi.



EKREM GÖRNÜ

**S**oreşgerê şeşti sere, piyê di şehîdan Ded ïzedîn, roja 01/06/1995 de, Sûka Adna de, welatê xerîbî de kontrayan gule na pa. O sifte bi dirbetin. Ê rojan de embezê ma rojnamegerî şiyê ci hetek û eya qisey bikrê. Ey destê xo hewadaybî, di giştê xo jî akerd bû û embazanê ma rî wina vat bi: ‘Ez nêmirana, wa dijmin biteqo û bimro. Ez şoreşgera, ez welatperwerê Kurdistanîya, ez piyê şehîdana û ez Dedê şima ïzedîna.’ La belê embazî ma, embazê şoreşgeran Ded ïzedîn, 24.06.1995 de şehîd kewt. Wa o dîroka maya newî de, bibo çila û ma vernî de tim û tim akew o.



- **21.07.1969:** Astronotên Amerikî Naşl Armstrong, Edwîn Aldrin bi "Apollo 11" cara yekem daktekin ser hîvê.
- **21.07.1971:** Partiya Karkerên Tirkîyeyê (TİP) hate girtin.
- **21.07.1996:** Aygün Uğur, li Girtîgeha Ümraniyeyê di rojya mirinê de can da.
- **22.07.1948:** Li bajarê Wanê, navçeya Bêgir (Özalp) li "Newala Sefo" 33 gundiyan kurd, ji hêla leskekeren tirk ve ên di bûn fermandariya Orgeneral Mustafa Muğralî de hatin qetilkirin.
- **22.07.1980:** Sazûmankarê TIP'ê û DISK'ê Kemal Türkler hate kuştin.
- **23.07.1996:** Altan Berdan Kerimgiller, li Girtîgeha Bayrampaşayê

di rojya mirinê de şehîd ket.

- **24.07.1928:** Peymana Lozanê hate morkirin. Bi vê peymanê parçeyê Kurdistanê yê di bin desthilatdariya İmparatoriya Osmani de di navbera tirk îngiliz û fransızan de bû sê parce, digel parçeyê ku ji berê ve di bin dest frâne de bû, Kurdistan bû çar parce.
- **24.07.1996:** İlginç Özkeskin li Girtîgeha Bayrampaşayê di rojya mirinê de şehîd ket.
- **26.07.1953:** Fidel Castro, bi êrişa Qışleya Manqodayê şoreşa gelê Kubayê bir serf.
- **26.07.1996:** Navenda Çanda Mezopotamya li Mêrsinê vebû.

## AWIR

# Heke bawernameya we ya zimanê kurdî hebe, hûnê bibine memoste



**Q**ursa zimanê kurdî (zaravayê kurmancî) ku Înstîtuya Kurdi ya Stenbolê berî sê mehan dabû destpêkirin heftiya çûyî qediya. Qursa ku bi 18 kesan dest pê kiribû bi serkeftina 12 kesan ve qediya û wan kesan bawernameya xwe ya serkeftinê standin. Der barê armancû gîringiye qursê û bawernameyê de Cigirê Serokê Înstîtuyê Hasan Kaya ev agahî dan me. Armanc ji bo rojê pêş gihandina mamossteyê zimanê kurdî û xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî û nav gel de bicihkirin e. Her wiha kesen ku bawernameyê jî bishtin di rojê pêş de wê bikaribin bi hêsanî dersên zimanê kurdî bidin, ev jî gîringiye qedandina vê qursê û girtina bawernameyê nişan dide.

Ji bo qurseke bi vî rengî pir daxwazî çêbûye, ji ber ku mercen ne asayı bûne wan nikaribûye dersên zimanê kurdî bidin her kesen ku dixwaze zimanê kurdî hîn bibe, lê Hasan Kaya li navçeyeke HADEP'ê dersên zimanê kurdî dane û li Înstîtuyê jî wan bi piranî ders dane kesen mamosse ji bo ku mamosse xwe bigihînin û li navçeyen HADEP'ê ew kes bikaribin dersê zimanê kurdî bîdin.

Wekî tê zanîn demekê berê li KÜRT-KAV'ê jî dersên zimanê kurdî bi awayekî ne fermî dihate dayîn, lê ji ber ku Wezareta Perwerdehiya Tirkîyeyê destûra fermî nedabû wan, ew qurşen ku wan didan ji aliye dewletê ve hatine qedexekirin.

Tevî van astengiyan iro pir kes dikare bi riya rojname, kovar û saziyên kurdî vê perwerdehiye bi awayekî ne fermî be jî bibîne. Li hêla din di vê pêvajoye de gîringiye zimanê kurdî jî bi awayekî

derkete holê. Cigirê Serokê Înstîtuya Kurdi ya Stenbolê Hasan Kaya dadixuyîne ku pir kes ji wan daxwaz dikin ku ew li navçeyen HADEP'ê û li cihekî taybet dersên zimanê kurdî bidine wan, ewê jî vê payîzê xebateke bi vî rengî bidine destpêkirin. Kaya bal dikşîne ser saziyên kurdan û di vî warî de jî diyar dike ku bi hevkariya saziyan wê ev xebat bêhtir bi pêş bikevin û hem ji bo pêşketina edebiyata kurdî û hem jî ji bo hînbûna zimanê kurdî wê pir bi feyde be.

Vê gavê qurs ji ber mercen ne asayı bi asterîgi be jî di awayê ceribandinê de ye, lê ev jî bo rojê pêş de wê bêhtir xurt be. Bi taybeti jî saziyeke wekî Înstîtuya Kurdi ku vî karî bi awayekî ciðî dixwaze bimeşîne gîring e, ev jî nişan dide ku saziyên kurdan ji pêvajoya avabûnê xelas bûne ber bi kamîlbûnê ve diçin.


Ev qurs hefteyê çar demjimêran hatîye dayîn, ji wan sê demjimêr dersên rîziman, demjimerek jî dersa wêjeya kurdî bûye. Niha jî li ser rîzimanê zaravayê kîrmâncî (dimîlkî) xebatek li Înstîtuya Kurdi didome.

Qurşen zimanê kurdî ji aliye Hasan Kaya û Sami Tan ve hatîye dayîn Hasan Kaya dersên li ser wêjeya kurdî û Sami Tan jî dersên li ser rîziman dane. Hate diyarkirin ku, kesen ku qurs qedandine pişti ku di imtîhanekê de bi ser ketine bawername standine.

Kesen ku dixwazin zimanê xwe yê zîmkarî hîn bibe, di vî warî de xwe perwerde bike bila demekê berê serî li navçeyen HADEP'an û Înstîtuya Kurdi bidin. Ev jî awayekî têkoşînê ye, divê her kurdê welatparêz hîn xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibe.

A. ŞENGAL

## ÇAVDÊRÎ



MIRHEM YİĞİT

## Hikûmet termometreya dewletê ye

**H**ikûmeta Mesut Yilmaz di nav şerekî teylanî de dengê baweriyê girt. Gava endamên partiya wî şirkîn wî yên di nav koalisyonê de jê re li cepikan dixistin, û Serokê Meclisî Kalemli ji bo spaskirinê ew vewwende ser kursiya axafînê, destê wî li ber çenga wî bû û bi îhtîmaleke mezin li çarenûsa xwe difikirî. Lewre berî bi saetekê Yilmaz Ayvaz Gökdemirê Partiya Riya Rast navê "Şahê Havînekê" lê kiribû û xwestibû bêje çawa me ji wê kursiyê xér nedît, tu jî tu dê çu xêrê jê nebînî.

Bi rastî jî zeman û mesafe ya nav du hikûmetan li Tirkîyeye çendî sal derbas dibin, ew çendî kurtir û trajiktir dibe. Periyodên çendsalî dadikevin salekê û sal jî dadikevin mehan. Ev zemanekî dirêj e ku her hikûmeta ku hatîye ser kar di nîvî rî de maye, yan jî di sal û mehîn destpêkê de eqiniye. Her hikûmeta ku hatîye berî ku berê xwe bibe serî, xwe ji pişti berdaye alî û das û qeynaxê xwe avêtine. Wezîr û serokwezîrekî ku bi wezareta xwe şâ bûbe û zemanê xwe yê qanûnî dagirtibe, bêje hema nemaye. Li Tirkîyeye hikûmetkîn û kar birêvebirin dijwar bûye û ji iro û pê de dê hê jî sextir û hê jî bi tesqeletir bibe.

Hikûmeta Erbakan jî mîna yên berî xwe sala xwe danegirt û emir da xwendevanan. Hikûmeta Yilmaz hat û pê re jî temenê wê bûye dabaşa meqale û nirxandinê rojnamevañan. Belê, hikûmetek tê û yet diç. Ev cûn û hatîn bilezîr û bilezîr dibe. Hikûmeta 50...53...55 û nizanîm çandan berdewam e. Ev delîl û nîşanîn bêşîşqarriyeke bêhendaze kûr e, bêhendaze giran e. Xuya û heşkere ye ku li Tirkîyeye istîqrar nemaye. Bêserûberiyeke her cureyî û gişî li dar e. Nexweşî û bêhna bi naşî ketiye ne bi tenê ji serî ye. Seranser û gewd bi carekê re daye ber xwe. Ev krîz, nexweşîyeke bêderman û bêçare ye, ne tiştekî din e.

Her cûn û her hatîna hikûmetek jî bi xwe re çend partîyen siyasi bêpreshîj û navno dike, dixwe, daduqurtîne û dike navê bênaverok, komik û civatîn şexsîn bêşexsiyet.

Mutabeqata heta niha hebû nemaye. Harmoniya nav organên dewletê têk diç. Hêdî hêdî çendserîtî bandêr dibe. Li aliyekeşî leşker, li aliyekeşî polîs û li aliye din jî meclîs mane. Ava esker û sivilan mîna berê bi cokerî de naçe, rîz û humreta wan beramberî hev ne mîna berê ye. Di bin çavan re li hev dinîren û berjewendiyen wan hev du nagirin. Ev jî şika beramberî artêşê, pîrozî û pakiya wê û bi gişî şika li dijî dewletê zêde dike, han dide.

Hefteya dawî te li kîjan meqaleya rojnameyekê ji rojnameyan dînhîrt te didît ku tijî êriş û gazin, reşbînî û dilsarı ne. Her kes ji wêbê û pêşeroja xwe bi şik e, ji rewşa welat û gelê xwe pişkul e. Tirs û xofa wê cî bibe, gelo pişti guhartina hukûmetê ev kaos û tevlîheviya digel dê rabe ya na, meraq dike û di nav paxav û mitalan de dinivîsîne şev û rojîn xwe dispêre hev.

Nexweşî û dileşîya ku heye ne a hikûmetan û partîyen siyasi, siyasetmedar û alternatifîn birêvebirinê bi tenê ye. Tu li eslê binêre û hînekî kûrtir dakevî, nexweşî û krîz ya dewletê ye.

Rast e, hikûmet û dewlet ne yek tiş in. Dewlet mekanîzmayeke kevtir, firehtir, mezintir û xwedîdesthilat û xwedîgötînên dewleta tirk û piş re gelê ku xwe tirk qebûl dike bi durêyekê re hatîne hember hev: Ya wê sebebîn vê rewşa iro baştıri bîbînîn û têkiliya wê bi pîrsa kurdan re çend û çiqasî teqdîr bikin deynin rastê û li ser vê bingehê bi kurdan re li gorî realîteya her du welatîn kurdu tirk û giş xelkîn din tê de dijîn idareyeke demokratîk û wekhevîparêz ava bikin, yan jî dê li ser xet û riya xwe ya heta niha israr bikin û sal bi sal hînekî din di nav petaxê de herin xwarê jîyana wan li wan bibe jehr û kerafî.

Ewil birêvebirîn tirk, xwedîdesthilat û xwedîgötînên dewleta tirk û piş re gelê ku xwe tirk qebûl dike bi durêyekê re hatîne hember hev: Ya wê sebebîn vê rewşa iro baştıri bîbînîn û têkiliya wê bi pîrsa kurdan re çend û çiqasî teqdîr bikin deynin rastê û li ser vê bingehê bi kurdan re li gorî realîteya her du welatîn kurdu tirk û giş xelkîn din tê de dijîn idareyeke demokratîk û wekhevîparêz ava bikin, yan jî dê li ser xet û riya xwe ya heta niha israr bikin û sal bi sal hînekî din di nav petaxê de herin xwarê jîyana wan li wan bibe jehr û kerafî.

# Rojnameyeke muxalif hêz û kesên



GERİNENDEYÊ GIŞTÎ YÊ ÜLKEDÊ GEÜNDEMÊ ERDEM ÖNAL

**P**işti girtina rojnameya Demokrasiyê, Rojnameyeke nû ya muxalif derket. Hûnê bikaribin kevneşopiya rojnameyen berê bidomînin, yanê xêza wan bisopînin?

● Beriya her tiştî divê rewşa iro di ber çavan re bê derbaskirin. Wê demê rewş çawa bû, Rojnameya Demokrasi çawa hate girtin. Divê ev tişt bi awayekî vekirî derkeve rastê. Li gorî me Rojnameya Demokrasiyê piştî birifinga (Genelkurmaya) Serkaniya giştî ku di 28'ê reseminiya 1997'an de hate dayîn, biryara girtinê derket. Artêşê bi vê kîrinê xwest ku ji nû ve dewletê organîze bike. Li gorî vê organizasyonê diviyabû ku dewlet çepgirîn xwe yên sexte, oldarê xwe yên sexte, rojnameyen xwe yên sexte û hwd. ji nû ve biafirine. Li hemberî vê kîrinê, têkoşîna azadî û aştiyê kelemê herî mezin bû.

Her wiha têkoşîna-rizgariya gelê kurd li ber polîtikayên dewletê wekî Amerîka û İsrail ku Rojhilata Navîn didan meşandin, ji asteng bû. Digel van astengîyan dewletê dixwast ku di şexsiyeta tevgera kurd de, li tevahîya Rojhilata Navîn eniya berxwedanê ya ku li hemberî imperializmê têdikoşê têk bibe. Eger di vê kîrina xwe de bi ser biketa wê gavê, tiştî ku dixwest ku di nav dewletê de bike wê baştır bikira. Li gorî wan, tevahîya kaniyên berxwedanê diviyabûbihata miçiqandin, heger qels bin ji diviyabû ji holê bihatana rakirin. —

Li gorî, me, Rojnameya Demokrasiyê li Rojhilata Navîn, dengê biratiya gelan, dengê azadî û aştiyê bi xwe bû. Sedema sereke ji bo girtina Demokrasiyê ji ev bû: Wê gavê dixwestin bikevin Başûr lewre ji rojnameyeke wekî Demokrasiyê ku iradeya gel temsil dikir, li hemberî imperialistian diviyabûbihata girtin, da ku wan karibûna karên xwe yên qirêj vesêrin.

Beriya her tiştî me ev rastî ji dewr

girt; zîhniyeta ku li holê ye zîhniyeteke leşkerî ye. Ji bilî xwe rastiya tu gelî na-pejirîne.

Dewleta tirk, li gorî mantiqê leşkeri dameziriye. Zîhniyeta dewletê, ji bilî xwe maşf jiyanê ji tu netewe, ol û alê re nabîne. Demokrasî, li hember van yekan û li hemberî çapemeniya rengîn bi awayekî muxalif derdiket. Bi tevan re ketibû pêşbaziyê. Bi derketina Ülkede Gündem beriya her tiştî armanca me ev e ku di riya ked û aştiyê de mîna dengê gelan em weşana xwe bidomînin. Em nabejîn ku em dûvajoya Demokrasiyê ne, lê nirkênu me ji wir girtine, emê di vir de ji bîdin jiyandin.

*Pêdivî bi rojnameyeke muxalif hebû, lewre hûn ji dizanîn ku rojnameyên muxalif her tim bi ेrişan re rû bi rû ne, hûnê bikaribin wekî rojnameyên din xêza muxalîf bûnê bidomîn in?*

● Di şertîn Tirkîyê de, weşanênu ku li Rojhilata Navîn rastiya gelên mazlûm ên wekî gelê kurd ifade dîkin; ci tirk ci ji kurd ji hêla dagirkeran ve hatine girtin. Têkoşîna ku tê dayîn jîxwe li hemberî van ेriş û kotekiyan e. Em dikarin bi hêsanî vê bibêjin ku pergâl (sistêm) tevahîya hêz û kesên ku li hemberî wê ala muxalefetê hildane ji xwe re neyar dibîne. Di vê çarçoveyê de em li Tirkîyê, bi rastî ji dibêjin ku derketina Ülkede Gündem hewce bû û ev hewcebûn ji roj bi roj xwe nişan dide. Ev pêdivî ne ji bo dewletê ye, ji bo gelan e, ji bo

**Hevalên me yên wê demê ji aliye teknikî ve qels bûn, kêm zanibûn. Digel van yekan vê gavê rojnamevanî çawa tê kîrin, nûçegihanî çawa tê kîrin, teknoloji çawa divê were bikaranîn başdır tê zanîn, pisporiyek hêja derketîye holê. Divê em ji kînasîyên berê encamên erêni derxin. Ji bo ku em di pêşerojê de dîsa rastî van neyîniyan neyîn.**

kesen ku nikarin xwe ifade bikin e.

*Weşanên rojnameyên ku berê derketibûn û hatibûn girtin li holê ye, rojnameya Ülkede Gündem wê prensibên rojnameyên berê bi ci awayî bi rê ve bi-be. Ango gelek nûçegihan xebatkar û belavker hatin qetikirin, avahî hatin bombekirin, her dem pest û kotekî li hole bûn. Gelo iştîmalek heye ku hûn ji rastî van ेrişan werin?*

● Me hewcedariya derketina Rojnameya Ülkede Gündem anî ziman, derketina rojnameyên Özgür Gündem, Özgür Ülke, Yeni Politika û Demokrasiyê ji li ser vê bingehê bû. Eger rojname ji bo gelan pêdivî be, divê ev pêdivî pêk bê. Lî heta iro em negihîstine mirad û mexsedîn xwe, heta iro ji bo ku em bigihîjin armancen xwe me gelek berdel dane û hê ji berdel tê dayîn û ji iro pê ve ji em

ÜLKEDÊ



amade ne ku bedel bidin. Armanci ci ye? Di riya aştiyeke birsumet de di merhaleyeke demokratik de, heta ku zilm û kedxwarî dakeve radeya herî nizm, wê ev xebat bê kirin.

Dibe ku rê û dezgele ji hev cuda bin, lê armanci yek e. Em rewşa salên 1990 û sala 1997'an mîna hev nabînin. Pêşveçûnên mezin çebûne, gelek şehîd hatine dayîn, kozik û çeperên neteweyî hatine afirandin. Di vê çarçoveyê de, hevalên me yên wê demê ji aliye teknikî ve qels bûn, kêm zanibûn. Digel van yekan vê gavê 'rojnamevanî çawa tê kîrin', nûçegihanî çawa tê kîrin, teknoloji çawa divê were bikaranîn başdır tê zanîn, pisporiyek hêja derketîye holê. Divê em ji kînasîyên berê encamên erêni derxin. Ji bo ku em di pêşerojê de dîsa rastî van neyîniyan neyîn.

*Dema mirov rewşa nû ji valakirina*

**gundan bigire, heta hebûna kontir-gerîla li ber çavan bigire, gelek rojnameger nikarin bikevine Kurdistanê, gelo hûnê karibin ji herêmê bi her rengî nûçeyan bigihînin xwendevanên xwe?**

● Em salên 1991'ê mîna salên xwe danpejirandinê dibînin, lê di vê rewşa iro de hêzên dagirker di warên siyasi û leşkerî de ji û di warê civakî û aborî de ji bi awayekî giştî xitimiye, ketiya nav bêcariyî û 'mutabaqata millî' ji belav bûye. Di vê navberê de navgînên mîna rojnameya Ülkede Gündem dikarin roleke girîng û pêwist pêk bînin.

Medya, iro di warê psikolojîk de, gelek bi hêz e li ser birêvebirina gel. Eger rojnameyek li gorî bîrdoz, sazî û zagonen dewleta nijadperest nemeşe, hêzên dagirker dixwazin bi awayekî qeti

wê ji holê rakin.

İro eger cih û warênd kurdan werin şewitandin û valakirin, cinayetên faîli meçhûl hebin, qetliam pêk werin, daristan werin şewitandin û van yekan ji, eger dewlet bi balafir û firokeyen xwe pêk bîne, ifadekirin û eşkerekirina van yekan wezifeya me ya sereke ye. Eger dewlet bi nêziktêdayîneke ne baş li gel û mirovan xwe binêre, ji sinorê wehşetê derbas bibe, ifadekirina van tiştan bi awayekî vekirî wezifeya me ye. Mîna rojnamevanen di warê çareseriya siyasi û danûstandin de ji ci ji destê me were emê bikin.

Gelek peywîren girîng û pêwist dikevin ser milê me. Divê bi awayekî rast, bi perwerdehiyeke baş em tiştan derxin holê. Ev yek ji divê bi giyana me ya şoşeger çebibe. Eger derfetên ku gel dane me, em baş bi kar bînin emê bigihîjin asteke payebilind, mesela di salên 1925'an de eger medya û telekomünîkasyon hebûya, wê raya giştî ya cîhanê, bi qetliamên ku di dema Serhildana Şêx Seîd de pêk hatibûn, bihesiya. Wê çaxê wê tevahîya cîhanê lanet li vê qetliamê bibaranda. İro teknoloji bûyereke bi lezgîni radigîhîne raya giştî ya cîhanê. Di vî warâ de divê em gelê kurd û tirk ji bandora ideolojiya şerê psikolojîk dûr bixin, gel nêzîkî rojeva xwe bikin. Mesela iro di nava çeteyen dewletê de pevçûniyek li holê ye, divê em der heqê vê mijarê de gel û xwendevanen xwe haydar bikin.

*Li gorî we rojnamevanekî muxalif an ji kurd divê çawa be? Xebatên xwe bi ci awayî bike?*

● Vê gavê beriya her tiştî, divê rojnamevanek li gorî sert û mercen Tirkîyê, bi taybetiyen gelên xwe baş bîzâne. Her wiha divê cografyaya ku lê diji, tevî taybetiyen xweş, nexweş, zor û



# Muxalif ji xwe re neyar dibûne



dijwar baş bizane û binase. Tiştê herî gi-ring jî divê, dagirkerên ku li hemberî wî sekînî ye baş binase, bi awayekî giştî jî divê rojnamevanê kurd şoreşgerekî/ê baş be. Yanê divê lêkoliner û lêgerîner be. Rojnamevan divê pêsiya xwe baş bîne. Rastî û xeletiyê, reşî û spiyê divê baş ji hev derxe. Divê bi şeweyke hûrbîni li bûyeran binêre. Divê rojnamevan bêhna bûyer û qewmînan ji dûr ve bistîne, heger bêhn neke, berî ku bibîne bi bûyeran nehese, jixwe wê gavê em nikarin bîbîjin ku ew kes rojnamevan e. Hege rojnamevan rola xwe baş bilize, hêza li hemberî xwe dikare provake bike û aloziyan derxe, her wiha dikare di warê lihevhatin û yekgirtinê de bi ser bikeve. Bi awayekî giştî em bîbîjin: Heke rojnamevan xwedî kommerayekê be, di bin de erebeya wî hebe, bi cihaz û amûrên bi şatafat be, ew rojnamevanê sîstemê ye. Ew kesen qels, ne afîrîner û bê qerekter in. Kesen bi vî rengî ku ji rastiya gelan, ji rastiya ked, aşî û azadiyê dûr in, ne serbixwe ne ji. Mîna robotan ew girêda-hinekan in.

Melzeme tê ber wan û ew jî radibin li ser maseyê rojnamevaniyê dîkin. Rojnamevaniya li Tirkîyeyê bi rastî jî li ser maseyan tê meşandin. Çavkaniya alozî û pirsgirêkan li bûroyê Enqereyê an jî li Stenbolê çareser nabin. Jêderka kaniyê li serê çiyan û li hevrêzan e. Lewra ji ger kana nûçeyan li ku be divê mirov li wir be, li ser çiya be, li bajaran, li taxên xizanan û kedkaran be.

*Ji bo rûpelên çand û hunerî rexne ji Rojnameya Demokrasiye re dihatin. Hûn dikarin bîbîjin wê Ülkede Gündem di vî warî de xurt be?*

● Di rûpelên çand û hunerî de, ji ber ku iro gelê kurd baş nikare çand û hunerî xwe li gorî gelên din pêskêş bike,

wê gavê em mecbûr dimînin ku ji çand û hunera kurdan a berê em istifade bikin. Xaka mezopotamya ku mîna dergûşa şaristaniyê tê binavkirin di warê çand û hunerî de xwediyê dewlemendiyek mezin e. Lewre jî divê lêkolineren pispor li wê derê lêkolînan bikin. Ji ber ku vê gavê şerekî qirêj tê meşandin em baş li berhem û nîrxen çand û hunerî xwedî dernakevin. Lewre jî em nikarin der heqê wan de binivisîn û di rojnameyên xwe de biweisînin. Divê gelê kurd vê yekê jî baş bizanibe ku di warê çand û hunerî de nikarin ji rojnameyek rojane baş sûdê wergirin. Di vî warî de barekî mezin dikeve ser milê lêkoliner û lêgerîneren kurd. Divê ew xebat û babetên di desten xwe de ne bidin me, da ku em biweisînin. Wê gavê ci ji destê me were, emê bikin ji bo xwendevanen xwe.

*Hetan niha we dest avête karekî wi-*

**Dîvê xwendevan xwe ji psikolojiya veşartina rojnameya xwe, xelas bilîn. Em ne rojnameyek ilegal in. Dibe liu dewlet vî navî li me bike û hî vî awayî were ser me. Lewre jî kesen ku karêm bi dizî dikin, ne em im dewlet e. Em karêm bi rûmet bilîn, hewce mîteku em xwe veşîtin.**

*ha an na? Mesela kurdîn lêkolîner û hunermend hene, berhemîn wan hene li Ewrûpayê we ji wan aîkarî xwest?*

● Me dest avetiye gelek deveran. Dibe ku me hinek kes ji bîr kiribin jî. Heta ji me hat me xwe gihande dosten xwe, lêkolîner, nivîskar, hunermend ên kurd û pêşverû. Heta me ji wan re wiha jî got: "Hûn dikarin li ser navê me jî xeber bidin." Lî mixabin em nikarin bîbîjin ku heta iro me encameke baş bi dest xisteye.

*Ji bîlî nûçeyan mijaren ku hûn li ser difikirin ji bo gelseydeye wan heye ci ne?*

● Em her gav vê dibêjin; rojnamevan bi tenê ne nûçeyanî ye. Bi taybetî ji bo rojnameyek wekî me ku muxalif be, divê em hem nûçeyê bidin

û hem jî şiroveyê bikin. Dema me ev yek kir, wê çaxê em dikarin ji xwe re bîbîjin ku em rojnameyek alternatif û dijber in. Heta iro me bi awayekî giştî, nûçeyan dan, lê me şiroveyen xwe nekirin. Ji iro û pêve dê di nava nûçeyan de hevkêse hebe. Mesela iro çeteyen li hole ne, bi hev ketine.. ev bixwe nûçeyan ye. Bêhna nûçeyek baş û binirx jê tê. Lî divê hindik be jî mirov şirove bike, ka çima nakokî çebûne, di navbera kê û kê de ne...

Beriya her tiştî iro kemasîya me, nebûna şiroveyan e. Sehkirina me heye, dîtina me heye, hîskirina me jî heye, lê em nikarin şiroveya xwe bikin.

*Di çapemeniya burjûwazî de an jî di ya din raqîbîn we hene?*

● Tiştîki bi vî rengî tune lê. Di warê demokrasî, aşî û azadiyê de me hedefek daniye ber xwe, di vî warî de em bi biryar in. Armanceke me jî ev e ku li hemberî çapemeniya derewîn û rengîn yekîtiya çapemeniya muxalif sosyalist û welatparêz were avakirin. Divê merhalayê de, helbet raqîbî me wê çapemeniya rengîn be.

*Xwendevanen we kî ne û çiqas xwendevanen Ülkede Gündem hene?*

● Xwendevanen me ango girseya xwendevanen me rasterast ji şerî qirêj nesibî xwe distin. Mirovîn wan hatine qetikirin, gundîn wan hatine şewitandin, qismek xwendevanen me jî di fab-

rîqeyan de keda wan tê xwarin. Ji bo tîrajî ez dikarim vê bîbîjîm; rojnameyek kesek tenê naxwîne, bi sedan kes dixwîn. Dibe ku kesen ku gundî wî hatibe şewitandin nikaribe rojnameyê bistîne, di warê ekonomî de piştgirîjî nikare bide, lê ci dike, disa fersendekî dibîne rojnameyê dibîne û dixwîne. Em dikarin vê bîbîjin eger 1000 rojname bê firotan em dikarin bîbîjin ku bi dehhezar kes 1000 rojnameyê xwendevanen, vê gavê tîrêja me 20-25 hezar e, lê em bawer in ku 250-300 hezar kes vê rojnameyê dixwîn.

*Paşgoya Ülkede Gündem jî heye, gelo wê ev bi awayekî valahiyekî rojnameyê dagire?*

Di warê şirove, hevpeyvîn û lêkolînan de derketina paşgoyê yanî "Ekgündem" wê valahiyekî dagire. Ez bawer

im ji ber ku di rojnameya rojane de gellek caran derfet tune ku tu wan biweisîn, di warê agahdarî, perwerdehî û ji bo şirovekîneke baş xebateke bi vî rengî pêwest e. Mesela bûyereke ji dîrokê heye, lê imkanen me tunene ku em wê di rojnameyê de biweisînin, wê gavê em wê di 'Ekgündem' de diweisînin.

*Hûnê li gorî rengîn nûçeyan, nûçeyan hilbijîrin wekî nûçeyen ku tene sansûrkîrin hûnê biweisînin?*

● Wezîfeye me ya sereke ev e ku ci nûçeyen desten me, em wan biweisînin. Mesela em dibêjin li Tirkîyeyê şerîki qirêjî heye, divê bi awayekî objektif em nûçeyan bigîhînin xwendevanen xwe. Eger gundiyeke ku di nava ser de be, ji me re agahîyan bisîne, an jî ragîhînin raya giştî, ew bi xwe rastiya gel e. Li hemberî kî sekînî be, bila bisekine, ragîhandina wê nûçeyan bûyere wezîfeye me ya sereke ye.

*Hûn rojnamevanen kurd yêni li Ewrûpayê çawa dibînîn û hûn ji wan alîkariyeke çawa dixwazîn?*

Ez ji rojnamevanen Ewrûpayê re tiştîki nabêjim. Lî ew kesen ku ji xwe re bîbêje ji bo ku aşî û demokrasî li Tirkîyeyê pêk were ez dixwazîn bi we re rojnamevaniyê bikim, deriyê me her gav ji wan re vekirî ye. Kesen ku vê yekê dîkin hene jî. Em bawer in ku piştgirî û alîkariyê bi vî rengî wê zedetir ji bibin.

*Mesaja we ya ji bo xwendevanen ci ye? Hûn ci pêşniyazî wan dîkin?*

● Beriya her tiştî em dixwazîn vê mesajî bidin xwendevanen xwe: Divê xwendevan li dengê xwe xwedî derkevin. Rojname ya wan e. Divê li xwe xwedî derkevin. Lî divê bi awayekî zanistî û bi rîexistîni li rojnameyê xwedî derkevin, heger ji rastiya şer ne agahdar bin di warê xwedî derketina rojnameyê de wê zerar bidin doza xwe. Divê tu car em malzeme nedîn hêza li hemberî xwe. Em bawer in û her dem dibêjin ku xwendevanen me politik in. Rastiya şer baş dizanîn û xwedî li rojnameyê derkevin. Xwendevanen me herdem wê bîbin muxabîren rojnameya xwe. Ev yek wê me ji koletiyê rizgar bike.

Li aliyê din divê xwendevan xwe ji psikolojiya veşartina rojnameya xwe, xelas bilîn. Em ne rojnameyek ilegal in. Dibe ku dewlet vî navî li me bike û bi vî awayî were ser me, lê divê em ji psikolojiya dizî û nepenî xelas bilîn. Lewre jî kesen ku karêm bi dizî dikin, ne em in dewlet bi xwe ye. Eger em karekî bi şeref û bi rûmet bilîn, hewce nake ku em xwe veşîrin. Her tiştî me vekirî ye, wexta ku me ev psikoloji ji ser xwe avet, emê zedetir bi pêş bikevin.

HEVPEYVÎN: AZADIYA WELAT



# Binefşâ Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî -v-

**M**ala bavê Binefşê konê xwe bar dikan û bi rê dikevin. Tên derdikevin cem Dewrêş Begê, Binefşê tînin li Dewrêş Begê mar dikan û daweta wan dikan. Em niha werin cem Cembeli:

Pira cezû vedigere tê cem jina Cembeli jê re dibêje: "Xanim, min karê te çêkir, êdi Cembeli di xewnêş șevan de ji Binefşê nabîne."

Haya Cembeli ji ji bayê felekê tune ye, qırçina def û zirnê ye, êl ji xwe re dawetê dilfize, roja çilê wan diqede, siwar û berbûye dawetê siwar dibin, berê xwe didin Mêrga Tewrêzê ku herin bûka xwe bînin. Gava bi diyarê mîrgê dikevin, bala xwe didin rasta mîrgê ku ne kon maye, ne bûk maye. Qêrîna teyr û tilûran e. Siwar û berbû dibêjin: "Weyla serê axê xwar be bi ser axê de, kî ci zane konê kîjan mîritiban di vê derê re derbas bûye, axa ji çav berdaye qîzika mîrtiba. Siwar û berbû careke din bi destê vala bi ser axê de vedigerin.

Cembeli ji li ber deriyê malê çavêni wî li riya bûkê ye. Bala xwe didê siwar û berbû ji jêr ve hatin tev bi mede ne. Def û zirne lê naakeve, Cembeli baz dide pêşîya wan, dibêje: "Gelo ci bû, ci qewimî çîma def û zirne lê naakeve?" Dizivire ser dengbêj dibêje: "Lawo tu çîma kîlamma nabêjî?" Dengbêj jê re dibêje: "Serê te bixwe bi ser te de, kî ci zane te qîzekî mîrtiban li ku derê dîtiye, te hew qas mîrov xistine pey qîzikê. Emê herin mîrtiban li ku derê bibînin qîzikê ji te re bînin?"

Cembeli bi dilekî bi kîl dizivire aliyê malê, gazî Aşıq Omo dike, dibêje: "Hespê min zîn bike, ji min re bîne." Cembeli li hespê xwe siwar dibe, Omo ji ji paş ve dide pey. Xwe ji jor de berî mîrga Tebrêzê dikan tên li şûna konê Fariz Begê digerin, lê dinêrin li dewsa konan ba û bobelisk rabûye, ji toz û xebarê pêşîr tîstek tune ye. Cembeli ji xwe re dibêje: "Binefşê li vir ji min re nan çêkir, ji vê kaniyê ji min re av anî, li ser vî kûcikî tilol dibe, bala xwe didê di bin kevir de pînekî pêçayî dîbîne. Pîne ji erdê hildide ji hev dedike, di nav de nameyek, du heb kap û du heb zêran dîbîne. Dizivire ser Omo, dibêje: "Omo tu dizanî maneya van kap û zêran ci ye?" Omo dibêje: "Na axayê min ez nizanim." Cembeli dibêje: "Omo maneya van zêran û van kapan ew e ku, eger tu mîr bî tu yê li pey min weñî, ev zêr pereyê riya te ye, eger tu ne mîr bî, tu van kapan hilde here di nav zarokan de ji xwe re bilize." Cembeli dema nameyê dixwîne ku eşq û hezkirina Binefşê fêm dike, vedigere ser Omo dibêje: "Ez êdi bi te re venagerim nava êlê, ez bimirim ji ezê li pey Binefşê herim." Dibêje: "Heta ku ez vegeterim; êla min, malê min, milkê min tev ji te re."

Omo dike nake Cembeli ji riya xwe



venagere. Cembeli xatirê xwe ji Omo dixwaze, li hespê xwe siwar dibe dikeve serê rî. Çol û çolistan, berî û berîstan, teze serê Cembeli kete xax û lorîn giran.

Cembeli pir tê, hindik tê xwe davêje gundekî, li perê gund xwe davêje malekê. Dibêje ezê li malikê çayekê vexwim û derbas bibim. Gava li derê malikê peya dibe, dibêje: "Malê hûn mîvana xweyi dîkin?" Pîrek derdikeve pêşîya Cembeli dibêje: "Mîvan mîvanê Xwedê ne, kerem bike were hundir."

Cembeli li ber derî hespê xwe girê di de derbasî odê dibe û rûdine. Pir bilez avê dikeline, ji Cembeli re dibêje: "Rabe serê xwe bişû, niha tu ji rî hatî westiya-yî." Cembeli radibe serê xwe dişû, pîre nan û çay didê, Cembeli dibêje: "Dayika pîr, de tu êdi destûr bide ezê rabim bi rî bikevim!" pîre jê re dibêje: "Bi xwedê te şaş kir tu hatî keşî hundir, êdi ez te bernadim." Cembeli jê re dibêje: "Hey hewar, hey medet, tu çîma wiha dikî, tu di şûna dayika min de yî, tu dawa ci li min

dikî?

Pîre dibêje:

*Lo lo xorto dilê min dibê yo  
Ev pazdeh salê min e ez mame  
bê mîr li vê derê yo  
Ez digerim nagerim ji xwe re mîra  
nabînim li dinê yo  
Min iro tu girtiye ez êdi te bernadim  
li vê derê yo  
Ez ê te xwedî bikim di nava cih û nîvin  
da bi kakilêñ gûzê yo*

*Lorî, lorî, lorî de looorî lorî*

Cembeli jê re dibêje:

*De metê dilê min dibê yo,*

*kelbê dilê min dibê yo,*

*melûnê dilê min dibê yo*

*De tu bidî xatirê Xwedê yo*

*Tu riya min berde li vê dinê yo*

*Çavêñ dergîstiya min*

*Binefşâ Narîn qerimiye*

*Li riya Cembeli Mîrê Hekariya*

*Berde bila xwe bigîhîne*

*Binefşâ Narîn li dinê yo*

Pîre bala xwe didê Cembeli nasekine, dibêje belkî ez Cembeli bi qîza xwe bidim xapandinê û Cembeli bidim sekînandinê:

Pîre dibê:

*Cembeli dilê min dibê yo  
De tu sebir bike heyâ évarê  
qîza min Xeyal Xanim bila vegere ji  
bêriyê yo  
Tu ji évarê heyâ sibê bikeve taxima*

singê

*Xeyal Xanimê jixwe re bike kîf û  
zewqê yo*

*Sûretê wê mîna henarê Döryolê yo*

*Memikên wê mîna sîvî Meletiyê  
sor bûye li serê darê yo*

Bejna wê mîna takrihana li serê

Sipanê yo

*Mîna gul û sosinê ku vedibin li serê*

Sipanê yo

*Ji xwe re pê re bike kîf û zewqâ dinê yo*

Piştî van gotinan Cembeli bala xwe didê ku çareya ku xwe ji destê pîre xelas bike tune ye; dibêje ezê sebir bikim heyâ évarê ku qîza pîre were, ez fen û fûtekê li serê pîre û qîza pîre çebikim û xwe ji desten wan xelas bikim.

Bila Cembeli ji xwe re di hundurê odê te rûne; em werin ser pîre û qîza wê:

Dibe êvar Xeyal Xanim ji bêriyê tê, bala xwe didê mîvanek di oda wan de rûniştiye mirov qêmîş nake li bedewbûna mîvan mîye bike. Xeyal Xanim dibêje dayê ev mîvanê me kî ye? Qey ev mîvan melaiketan ji min re şandiye?

Dayika Xeyalê dibêje: "Na lawo melaiketa ew ji min re şandiye"

Li ser Cembeli pîrê û qîza xwe, ew dibêje na Cembeli yê min e; qîza wê dibêje na Cembeli yê min e! Li ser vê yekê her du radibin li hev dixin. Paşê pîre gažî qîza xwe Xeyal Xâmine dike û jê re wiha dibêje:

*Xeyal Xanim dilê min dibê ye  
De tu dizanî dayika te ya pîr ma ye  
bê mîr li malê ye*

*Kesek min nastîne li dinê ye*

*Tu qîzeke xweşik û ciwan ji here  
xortê mîna xwe bibîne li nav êlê ye*

*Ji xwe re bi xortan re bikeve kîf û*

zewqê ye

*Tu Cembeli bihêle ji bo min pîr ye  
lorî lorî loorî lorî*

*Xeyal Xanim gazî pîre dike:*

*Dayê dilê min dibê ye, kelbê dilê  
min dibê ye,*

Melûnê dilê min dibê ye

*Lê tu nizanî ez vî xortê han ji te re  
nahêlim li malê ye*

*Tu rabe xwe berde nav êlê ye  
Kalê mîna te pir in, tu ji xwe re*

yekî bistîne li nav êlê ye

BERHEVKAR/  
SERVET YÜKSELİR



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê  
Li NCM'ya Stenbolê

● **20.7.1997 Yeksem:** Konser: Grup Kivilcım "ji Qepqasyayê ber bi Anatolyayê ve", saet:14.30  
Dîlan- Gulên Mezra Botan, saet:18.00

● **23.7.1977 Çarşem:** Semîner Ismail Göldas Peymana Lozanê, saet:18.00

● **25.7.1997 ûn:** Ji Beşa Sinemayê film: Iz (şop), Derhêner: Yesim Ustadoğlu saet:18.00

● **26.7.1997 Şemf:** Defileya Yekîtiya Malbatê

Mezopotamyayê. saet:14.30

Şano: Ji Teatra Jiyanâ Nû İftika Rojbaş, saet:18.00


Li NCM'ya Îzmîrê

● **20.7.1997 Yeksem:** Konser Koma Welatê Rojê, du seans:14.30-18.30

● **26.7.1997 Şemf:** Xwarin (Roja Xwarinê Netewî ê Kurd), saet:19.00

## AWIR

# Ji welêt du lîstikên watedar



ANOYÊ

**S**ano hunereke girîng e ji bo gelê dînyayê. Pêşkêkirina jiyanâ gele-kî bindest karekî bi rûmet e. Di nav kurdan de jî piştî salên 1990'î pê-wistiya şanoyê xwe nişan da. Li gelek cihen Kurdistanê û Tirkîyê, bi taybetî ji li metrepôlên mezin digel gelek zordestî û qedexekirinan jî car caran hinek lîstik derdi kevin ser sahneyê.

Şano di hişyarkirina gelekî ku ji rastîya xwe dûr e û li ser çand û hunera xwe ne xwedî zanîneke dorfîreh e, alaveke pêwist e.

Ji Kurdistanê komeke şanoyê li Stenbolê li Navenda Çandê ya N. Fazıl Kissakürek roja şemiyê (12'ye tirmeha 1997'an) du lîstik pêşkêş kirin, yek ji wan Öz (tol), ji hêla Orhan Asena ve hatiye nivîsandin û ya din jî "bir ishaksin, bir cemil (tu isheqek i, tu cemilek i)" ji hêla Yılmaz Erdogan ve hatiye nivîsin.

Navê koma ku ev lîstik pêşkêş kirin, Diyarbakır Halk Oyuncuları (Lîstikvanen Gel ên Amedê) ye. Lîstika yekemin "Öç" bi derhêneriya xebatkarê komê Emin Yalçınkaya hatiye amadekirin. Lîstika Öz ji aliye komê ve bi şeweyekî baş hatiye amadekirin, lê hin kêmasiyên malzemeyên teknikî jî tê de hene. Lîstik çirokeke klasik a kurdan e. Yanî yek ji keçikekî hez dike û nikare bi dest bixe an axayê gund dest datîne ser keçê, an jî hin malbatê dewlemend. Bi kurtî di lîstika "Öç" de senaryoyeke wiha heye.

Hesso ketiye pey Kezbanê, xewnan dibîne, wekî dînan li gastîna diçe û tê, daxwaznameyan dînivîse dide dadgehê, lê dadgeh jî piştgiriya axê dike. Belê bi ser

ev qas tiştan de şûrê edaletê jî li ser serê wî li ba dibe. Hesso her çiqas qîrîn û ga-zina jî dike jî bêfeyde ye, daxwaza axa bi ser ya Heso dikeve û Kezban ji axê ra dimîne. Di vê lîstikê de lîstikvan rolê xwe baş pêk tînin. Lîstik bêdadiya li Tirkîyê bi awayekî zelal dide nişan.

Lîstika duyemîn jî bi derhêneriya M. Sait Alpaslan ve hatiye holê. Naveroka lîstika bi navê "bir ishaksin bir cemil" si-yasi ye. Di lîstikê de mirovîkî jî doza sî-yasî tê girtin û dikeve girtigehê, di girtigehê de jî mirovîkî ku ji doza adlı hatiye girtin, heye. Ev mirov xwedîyê bawerîyeke xurt a îslamî ye, lê însanekî nezan e. Girtiyê siyasî dixwaze bi wî re têkiliyê deyne, lê ew xwe jê dûr dixe, naxwaze ku navê wî bi yê siyasî re derkeve. Mirovî siyasî dixwaze ku pê bide zanîn, ew ji bo neheqî ya ku li ser gel tê kîrin li wê derê ye. Di navbera wan de dostaniyek çêdibe, lê girtiyê adlı hêviya xwe ji serokomarê tîrk nabire, di dawiyê de jî dike qurbanê vê bawerîya xwe. Belê di vê lîstikê de kêmasiyeye bicihanîna rolê siyasî heye. Wekî lîstikeke sansûrkîri jî tê xuyan, hin tîst bi zêdeyî veşarî mane.

Her wiha lîstikvanen şanoyê hez kîrine ku coşkeke mezin bidin nîşan, lê ev yek pêk nehatiye. Digel vê jî ji ber ku ev kom ji welêt hatîbû di dilê gelek temâşevanan de germahîyeke pêk dianî.

Lîstikvanen Gel ên Amedê: M. Emin Yalçınkaya, Şabettin Dağ, Vural Tan-tekin, Uğur Akmeşe û M. Sait Alpaslan.

AZAD ALTUN

## TÎSK

LERZAN JANDÎLM



"Heşê mordemî  
texteyê  
cerebnayene niyo"

**B**inê manaya na vatena de çiyê zaf qedî vindeyi. Heş, fam, fikir, mezg vir aziyena şiklê hereketê mordemî de, şikle bawariya mordemî de, meselayan de niyadayan û izaikerdena mordemî de rolêde girs kay kenê. Bê nînan mordemî (însan), mordemêde xoser, azad niyo. Bê nînan mordem nêşikîno xoser, azad bifikiro û angoranê naye ji (angoranê fîkr û bawariya xo) hereket bikero.

Ma, heşê mordemî kotî beno texteyê cerebnayêne? Cewabê perse, ziwan (zon) o. Yanê heşê mordemî warê ziwan û xebetnayena ziwanî meselâyêde ebi kîf niya. Eke kam ci amê verê fekî vaco, manayêde bingeqesan, manayêde yewbinan (jûbînî) famkerdene nêmanena. Kesî yan naye ebi nezanayene kene, yan ji ebi zanayene. Eke yew kes ebi nezanayene naye bikero, sebeb ci beno wa bibo (ma vacîme nêwendene, dibistan nêşiyayene, wayîrê ziwanêde definitif- (konkretil) nêbiyene) mordem şikîno na yewe (jûyê) fam bikero. Hama eke yew kes yan ji kesî, qomî naye ebi zanayene kenê, ganî mordem bifikiro. Nê kesî, qomî na yewe qeyî ebi zanayene kenê?

Ma vacîme Tirkîye de nameyê yew teror û cinawîrî veciyo. Her kes terorî ra, cinawîrî ra qesê keno. 'Tororê trafikî', 'cinawîrê trafikî' ûêb. Yan ji nameyê welatperweriye, welatxayîniyeye veciyo. Kesê mafya biyê û benê "welatperwer", kesê welatperweri benê 'xayîn' û 'xorote', tîranî, sistemê koledariye, diktatoriye bona-partîste bêna, 'demokratîk', 'laik'. Kesê nedemokratîk û nelaik ji benê 'demokratîk' û 'laik'

Na tewetebiyene yan ji tewetekerdenêde xirab a. Na nîşanê armanc û mentalitaya koledarî ya. Serba naye ji koledarî tim hama tim bingepersan de, zanayane şaran de, heşê kesan de key kerdo û ewro ji kay kenê. Ciyan ebi nameyê dînan name nêkenê, nameyan vurnenê. Naye ji ebi ïnat, hatanî ke destê dînan ra amê, kenê. Koledarî heşê bindestan hêni manîpûle kenê, mezgê dînan hêni şunê ke bindestî meflkiyî û, vatena'koledarî zê koledarî fam bikerê, itîraz mekerê.

Bindest ganî mevîno û mevaco; Ma ci eleqaya teror û qezayanê trafikî piya estê? Yan ji ke 'terorê trafik' esto, sebebê dê nevirastena rayan niya?

Ewro ji hêni aseno ke hukumato newe ji nê metodan xebetnerin. Ecevît mese-laya şarê ma ebi pêdemendene, ebi faqiriye name keno. Qey ti vana na mesela teze Ecevît kefş kerda, zaf çiyêde bi qedr doz kerdo. La belê Ecevît huneke 'sasyol demokrat' bî ji na şoveniya dê biye û nameyê daye ji 'welatperweriya sosyal demokratî' bî. Demoke Ecevît 'sosyal demokrat' bi ji, welatî xo ra heskerdene, wayîrê heqa xo verciyene, bêna 'xayıntiye' û 'teror' bî. Sistemî vuriyayî, bawarî vuriyayî, Afrîkaya Başûrî vuriyî, ebi kilmiye dinya vuriyê, la belê Tirkîye saya sarê politîkvanê xo (ha çep ha raş, ha laik antîlaik) leşkeriya xo nêvuriye.

Ham ewro koledarî naca çiyê xo vîra kenê. Ê, yanê koledarî heşê mordemanê ma de nêşikînê cê verî kay bikerê. Cişke şarê ma îndî nameyê ciyan muso û zano.

Naca karê koledaranê baqilan o wo ke na realîteya şarê ma, zanayena şarê ma qebûl bikero, angorê dayê ji gaman berzo. Raştiye ji a wa, ke nê gamî bêrê eştene, na gonî bêro vindarnayene. Eke nêkerd se beno? Zê ma ê ji zerar vînenê, binê nê mobâlî de verê dîrokê de hesab danê.

# Ji baxçeyê çanda gelêri çend kulin

- ◆ Ji xelkê re jîr e, ji xwe re kor e
- ◆ Xwedê mal û milk da we, yê me jî mîranî û simbel daye me
- ◆ Destê tenê deng jê nayê
- ◆ Darê xwar ne ji erdê re dibe, ne jî ji bêre re dibe
- ◆ Lihevanîn, ji jêhatibûne çêtir e
- ◆ Peyva pir ji mîrikê ehmeq re ye
- ◆ Dawe têkeve mista mîrikê xerab, çenâbe
- ◆ Tişte biçûk mezin neke, yê mezin jî biçûk neke
- ◆ Roj bi rîtinê naçe ava
- ◆ Goşt bê hestî nabe
- ◆ Biratiya min û te wek a gur û rovî ye
- ◆ Tirs, mîrga rovî yê
- ◆ Birakê xwarinê tim xeyidî ye
- ◆ Dost di cihê teng de belî dibe
- ◆ Mîr li meydanê belî ne
- ◆ Mîr ji bo mirinê ye
- ◆ Timahî birakuji ye
- ◆ Ê bilind bifire, wê nizm bikeve
- ◆ Mastê ceribandî ji yê neceribandî çêtir e
- ◆ Karê pîreka dewê çeleka
- ◆ Kero mîna her ro
- ◆ Çû seferê hat kerê berê
- ◆ Eqrabatî zérê veşarti
- ◆ Tu bitirsî jî wê zikê te bişewite
- ◆ Qız li ser hespê ye, kes nizane qismetê kî ye
- ◆ Qız sêva li ser darê ye, her kes çokê xwe diavêjê
- ◆ Tişte mirov jê bibehice wê bê pêsiya mirov
- ◆ Hevalê barê ketî tuneye
- ◆ Hevalê agirê xweş pir ne
- ◆ Dilê bi xezeb nagihêjê mirada
- ◆ Pişti tengasiyan firehî ye
- ◆ Piranî mîraniyê betal dike
- ◆ Mîrikê çê li paş ê xerab nasekine
- ◆ Çavê şerpiji yê kor çêtir e
- ◆ Peyvê pêsiyan talan nabe
- ◆ Gedek yêmîş malê ye
- ◆ Aqil taca zérîni ye, ne li serê her kesi ye
- ◆ Tu agir bî, tu ancex xwe bişewitîni
- ◆ Kar û xisar birayê hev du ne
- ◆ Jê keto pê keto
- ◆ Kija xêr be Xwedê wê bike
- ◆ Tişte xwes ji yê nexwes çêtir e
- ◆ Ji keda lepa kes têr naxwe
- ◆ Dewlet dewlet bûya millet nedihat di vî halî de dernediket
- ◆ Nezzantiyê ser nekirîye,

- mîrantiyê şer kiriye
- ◆ Law gavekê di pêsiya bavê de ye
- ◆ Îşev sînik hatiye zê
- ◆ Te li ser pişa gê û masî sekindandiye
- ◆ Xew û mirin yek e
- ◆ Heya mirinê gav û çav
- ◆ Dunya saeta mirov tê de ye
- ◆ Bela meriv ji ber nigê meriv dertê
- ◆ Her malekê daşek
- ◆ Telîkek goşt her eyb û arê insan winda dike
- ◆ Her malekê dînek
- ◆ Mar qulika xwe nas dike
- ◆ Rev nîvî mîrantiyê ye
- ◆ Tu nekî, tu naxwî
- ◆ Dunya hola vala ye
- ◆ Hezar carî bifikire û carekê bêje
- ◆ Kew dijminê qewmê xwe ye
- ◆ Ji garanê çû niha golika xwe
- ◆ Meriv ne di malekê de be, meriv nizane hewalê
- ◆ Dizan ji dizan dizî erd û ezman lê pîrsî
- ◆ Mîvanê derewîn carekê nîn dixwe
- ◆ Mîvanen destvala ne bi xêr û ne bi ala
- ◆ Ker ker e, ku tu bajo wê here
- ◆ Bila ne di meriv de be, bila di hevalê meriv de be
- ◆ Mirov li xerîbiyê kor e
- ◆ Gur pîr dibe, dibe qesmerê roviya
- ◆ Girara pîra tim kiziñi ye
- ◆ Bira debir ji meriv bimîne bira meriv jê nemîne
- ◆ Karçiyê xwe ye û şêrînê hevala ye
- ◆ Texbûrî ji gayê cot re namîne
- ◆ Bi biçûka re biçûk e, bi mezinan re mezin e
- ◆ Namûs nema li bûka, xew nema li zaroka
- ◆ Ga pişti baranê cil nake
- ◆ Desthilanîn fereca xêrê ye
- ◆ Co (dar) ji cenetê derketiye
- ◆ Sêr ji meydan dikeve, rîvî tewl dide xwe
- ◆ Rêvî ji baranê bitirsiya wê ji xwe re kurkek çêkira
- ◆ Xwedê teala kesi bêhiş neke
- ◆ Xwedê kesi ne şas bike, ne fas bike
- ◆ Şas kir fas neke fas kir, (bila) kaş neke
- ◆ Pirek darekî şkestî ye
- ◆ Ker bi kerîtiya xwe di neqebekê de dikeve cara dudnya tê re naçe

- ◆ Bifirosê kerê res, bide xwarinê xwes
- ◆ Tu kar bikî tu birçî namînî
- ◆ Destê betilî li ser zikê têr e
- ◆ Te destekî da bila destê dinê pê nehese
- ◆ Xêr bike berde ber çem
- ◆ Xêr bike bila xêr bê pêsiya te
- ◆ Bûkek anî bi lez û bez, sivika malê ma ez
- ◆ Warê xwe genî neke
- ◆ Diya mirov tim lawan nayine
- ◆ Konê res bênamûsiyê naxwaze
- ◆ Gurî bûye, xwe di dîwaran dide
- ◆ War ew ware, bihar ne ew bihar e
- ◆ Gayê xerab tim golik e, zilamê xerab tim lawik e
- ◆ Erd zevî tîne, cotkar pesnê xwe dide
- ◆ Berxê xelkê di koza meriv de mezin nabe
- ◆ Ger bilind e, heyî carekê riya meriv pê bikeve
- ◆ Dinya dara meraqê ye
- ◆ Xwîn bi xwînê paqij nabe, xwîn bi avê paqij dibe
- ◆ Xwîna wî ne hêjayî pênc quruşa
- ◆ Qîza qereçî nabe xatûn
- ◆ Ez geriyam Şam û dinê xelas nebûm ji ber mirinê
- ◆ Benîştê dîna ji lîtirê ye
- ◆ Malê meriv pêş çavê meriv e
- ◆ Benîşt cûtiyê xem û xeyal ji dila çûyê
- ◆ Mirov pîr dibe, dil pîr nabe
- ◆ Kewê gotiye ez hivdeh hêka nakim wê hivdeh kul di min de werin
- ◆ Zikê diya baxçeye jê dikeve her awayî
- ◆ Çavêlî li deriya xwîlî li seriya
- ◆ Ya xal e, ya fal e
- ◆ Golikê malê ji gayê malê natirse
- ◆ Wek ê ber dévê weled camiyaye
- ◆ Cîranê meriv nebaş be, meriv jê direve
- ◆ Mîrê baş ne dipirse li paş û ne dipirse li pêş
- ◆ Hingê min got ziman golik di devê min de hat
- ◆ Peyvê zilama, di civatê de kîrtê hesinî ye
- ◆ Ker bi werîs tê girêdan, insan bi peyvê
- ◆ Berê gotiyê emê li bergiran siwar bin, êdî dibêje emê li kerê siwar bin
- ◆ Ez li ku dixim, deng ji ku tê
- ◆ Wer hasılı hasil çû di müsilî derket

- ◆ Tişte te got doh bû
- ◆ Her bayek bê tu li ber kevî her avek bê tu li ser bikevî tê ji dinê derkevî
- ◆ Min got lêxê, min negot bikuje
- ◆ Pirê nemre bihar tê, kalo nemre pincar tê
- ◆ Kêfa wî wek kêfa kerê nîr e
- ◆ Timî li cem wî wekî diwanzdehê adarê ye
- ◆ Devê rîvî nagihêje hejîrê dibê kerik e
- ◆ Nan û şîr taştiya mîr e
- ◆ Nan û mast taştiya serast
- ◆ Ne bela cange ye, çelek bi ga ye
- ◆ Bû war wara kara, şorbe bû jahra mara
- ◆ Ker tê bixwe, wê tira bike
- ◆ Çira tu kesî vêxistî namîne heta sibê
- ◆ Bi rûyê xwe ve ritiye û bi mîza xwe şüştîye
- ◆ Tu bibêje mîza te derman e, wê hilfirîne erd û ezmana
- ◆ Xew ji mewîja xwestir e

## Biwêj

- ◆ Benê dû şûjinê ye
- ◆ Ka em ci xwelî li serê şeytan bikin?
- ◆ Namûs bûye bexdenûs
- ◆ Wek gurê dev bi xwîn e
- ◆ Wek kiso di qalikê xwe de ye
- ◆ Tu wek gêrikê yî
- ◆ Çûn hefya bavê, qûna dê li ser kirin
- ◆ Kurmê şîrê, heta pîrê
- ◆ Ev hevîr wê gelek av hilîne
- ◆ Xwedê mala mezin biçûk û mala biçûk jî mezin neke

## Nifir

- ◆ Xwîlî li kesê bêwar be
- ◆ Tu xwîn verişi
- ◆ Jan li te keve
- ◆ Ecêbên giran bêne serê te
- ◆ Tu bikî têr nexwî
- ◆ Hewara te bê
- ◆ Mala te mîrat be
- ◆ Miraz di çavên te de bimîne
- ◆ Agir bi mala te keve
- ◆ Tu xêrê ji xwe nebîni
- ◆ Çûyîna te hebe vegera te tunebe
- ◆ Destê te bişkên

# Jiyana Rewşen zêdetir kurdistanî dibe



**H**ejmara nû ya kovara NÇM'ê Jiyana Rewşen bi dosyayek berfireh li ser Mîr Celadet Bedirxan derket. Di vê hejmara kovarê de Konê Reş, Feqî Huseyin Sağnîç û Zana Farqînî li ser jiyana Celadet Bedirxan û cihê wî yê di dîroka rewşenbîriya kurdî de agahiyên balkêş didin.

Hejmara 10'an a kovarê bi pêşgotineke li ser îxanetê dest pê dike. Di vê pêşgotinê de helwesta PDK'ê ya di dema tevgera dagirkirinê ya Artêşa Tirk de tê rexnekirin. Di vê hejmara kovarê de niviseke Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen bi sernavê "Vegera ser warê bav û kalan" cih digire. Hesen Zinar di vê hejmara de li ser rewşenbîre kurd Nûredîn

Zaza nivîsek amade kiriye. Di vê nivîsê de bi giranî li ser jiyana û berhemên wî tê rawestîn.

Bi boneya salvegera 3'yan a şehîdketina hunermendê şoşerger Ali Temel, endamê Koma Ciya Hasan. Öcalan li ser wî nivîsek amade kiriye. Ev nivîs digel agahiyên li ser jiyana û hunermendiya Ali Temel, bi helbestê wî jî hatiye xemilandin. Di vê hejmara Jiyana Rewşen de nivîsa bi sernavê "Heya kengî xiyanet û ticaret bi xwîna gelê kurd" hem bi naveroka xwe, hem jî bi nivîskarê xwe balkêş e. Lewre nivîs li ser dîroka siyasi ya PDK'ê agahiyên balkêş û cihêreg dide. Her wiha nivîskar Şiyar C. Oremar jî ji rojhilatê Kurdistanê ye. Ev jî ji bo kurdên Bakur tiştekî nû ye, lewre ji bilî nivîsên A. Şerîfî dengê kurdén Rojhilat zêde nedîgîşt Bakur.

Ji bilî vê nivîsê gelek nivîskarê kurd bi çirok, helbest, nivîsên xwe yên lêkolînî di vê hejmara Jiyana Rewşen de cih girtine. Kesêne wekî M. Zahir Kayan, Abbas Alkan, Ebdurreqîb Yusuf, Necat Ayaz di vê hejmara de jî bi berhemên xwe balê dikîşînin.

Divê bê gotin ku hem ji aliye naverokê ve û hem jî di aliye zimê de ev hejmara Jiyana Rewşen ji yên berê pêşkeftir xuya dike. Ev jî nîşana gihîştina kadroyê kovarê ye. Li gorî hejmara 9'an çewtiyên rastnîvîs û rîzimanî gelekî kêm bûne. Bi kurtaşı mirov dikare bibêje, ev hejmara Jiyana Rewşen zêdetir li ser çand û hunera kurdî ye û jê zêdetir hilma Kurdistanê difûre.

SERWÎSA ÇANDÊ

dike, dixwaze hêza beramberî xwe qels û bê hêz bike ku li gorî berjewendiyê xwe binirxîne, ger jê re çareserî tê gotin "çareser bike." Çareseriya pirsgirêka gelê Kurdistanê, bi rayedarên tirk ên xudanê mêjûyên nîjadperest re nayê çareserkirin. Divê mirov ji dijmin gazinc û lomeyan neke, ji wan tu hêvî û daxwaz jî nayê kîrin. Ji dijmin re, dijayetiye mîrxasî pêwist e. Ji bo xayin û sîxûrên gelê kurd ci pêwist e? Bersiva van jî cuda nîn e, ji bersiva kedxwarên tûjtir û hêztir, bersiva bi biryarî pêwist e, gunehêن xayînê axa, nişîman û doza pîroz nayê efûkirin.

Em kurd gotina kurmê darê ne ji darê be, dar pûç û rizî nabe, gelekî dibêjin, divê êdî em nebêjin kurmê darê bikujin dexin, da ku dar şax û gulîyan vede, hêşîn bibe, pûç û rizî nebe, şenatiyê bide derdora xwe, fêkiyan bide. Mesûd Barzanî û PDK jî bûye kurmê doza gelê kurd. Ez ji bo wî navekî din nabînim. Em bibêjin axa, şex, mîr, serok, polîkvan û her wiha navdar, em xwe dixapînîn. Ji ber ku ew ji wan yek jî heq nake û bi cih nayîn. Axa li gorî xwe xwedîyê hin prensîban in. Bi cîranê xwe re baş derbas dîkin, pirsgirêken di navbera xwe de bi têkiliyan çareser dîkin. Li aliyê

mehê cih girtine.

Li gel van mijaran, bi sernavê wekî "navê asîmîlasyonê 8 sal hê-votin", "di komkirina civanan de berpirsiyari û afîrînerî", "di destpêka havînê de xwendin û lêkolîn", "derdê imtehanî; yêq zezenç dîkin, yêwinda dîkin", "reportaja bi Komîleya Karkerê İnşeatan re", "Ci-yayê And hişyar dibin" nivîs û mijarêne rojane û dîrokî hatine nivîsin. Dîsa nûçeyen şer ji welêt û nûçeyen livbaziyên karkerê ciwan jî di hejmarê de cih digirin.

Kovarê dest avetiye erdnîgariya Kurdistanê û bi sernavê "Welatê Rojê (Qers)" li ser dîrok, erdnîgari



## Weşana ciwanêñ welatparêz xwe nû kir

**P**ıştı ku kovara siyasi-çandî ya mehane "Özgür Yurtsever Gençlik (Ciwanêñ Welatparêz ên Azad)" hate girtin, içar bi navê "Özgürleşen Yurtsever Gençlik (Ciwanêñ Welatparêz ên ku azad dibin" kovareke nû derket pêşberî ciwanêñ welatparêz.

Di kovarê de nirxandin û ropor-tajen li ser dagirkirina başûrê Kurdistanê bi firehi cih girtine. Bi me-bestâ salvegeren çalakî û berxwedanen şexisetên şoşerger wekî çar lehengen ku di rojiya mirinê de şehîd ketin û Zilanê, ji dîvî girtiyen PKK'yî yên jin, girtiyen jin ên ji dozen cur bi cur, daxuyanî hatine girtin û bi kesêne di nav gel de roportaj hatine kîrin. Her wiha li ser şehîdan Zilanê şîir û nivîsa Serdar Kara; nivîsa bi sernavê "İntikam Görevi" ji bo 29'ê Pûşperê Serhil-dana Şêx Seîd (salvegera 72'yan) û nivîs û şîirê ji bo şehîden 14'ê tîr-

û folklora bajêr lêkolînek hêja hatîye çekirin. Bi sernavê "Hêviya min veşarî ye" serpêhatiya gerîla renge-kî xweşik dide kovarê. Tiştekî nû ku hatiye pêkanîn jî pêkenok û metelok û xaçepirsa bixelat e. Ew tiş dîkin kovar zêdetir xîtabî xwendavanar bike û bêhtîr balê bikişîne ser xwe.

Belê 'rojnamegeriya kurdî bi ceribandinê bi pêş dikeve'. Bi van nivîs lêkolîn û roportajen hêja ku bêhna ked û tabê ji wan tê, dê ev kovar cihê kovara berî xwe bi awayekî xwestir û geşir dagire û deng û awaza ciwanêñ welatparêz bigîhîne welêt.

Mixabin kovar, xwerû bi zimanê tirkî ye, gelek ciwanêñ welatparêz ên ku bi vî zimanî nizanîn wê nikarîbin jê sîdê wergirin. Bergê kovar rengîn e û ji 60 rûpeli pêk hatiye.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Divê kurmê darê tune bibe

AHMET BARÂÇKILIÇ



**D**i rojêvî de dagerkirina Artêşa Tirk kuştina kurdan bi helwesta tunekirina hêza azadiya Kurdistanê heye. Di vê demê de ji her dêmekê zêdetir, pêwist e ku her kurdek bi kemasî hinekî bi xwe bihese, hinekî bilive, li dijî hovîtiya roma reş bi arama tolhildanê û ji bo jiyîna wekî mirovan li ser wê axa kumaxkirî her tişî ji nû ve vejîne. Pêwist e binivîse bifikire, bilive, bi kurtayî gah bin, ferman-darê ARGK'ê û çalakiyân pêk bînîn. Riya bingehîn, û hemû rîkên aşîtî û azadiyê di wir de deraz dibin. Di cîhanê dê, bi dehan gelên mîna me di wan riyan de derbas bûn. Çeçenîstan ji van yek e. Bi çekdarî li ber xwe dan, şer kirin, li gorî xwe pirsa xwe li ser masê çareser kirin.

Pirsa kurdî ji ber vê çareseriye diç, ji bo wê ye ku Komara Tirk bi hovane êrîşan

din bêbextiyan nakin. Şêx jî serok jî û her wiha kesekî xudanê erk û delamet wilo nake. Wilo bêbext nabe, bê prensîb nabe, xwîna nîjada xwe bi destê dijiminê kurdayetiye jî.

Bi rastî vê êrîşa 14'ê gulanê gelek tiş û rûcîkên gelekan eşkere kîrin, ew daxuyanî Şerâfetin Elçi jî bihîstîn, xwendin, vî elçiyê tîrkan di demeke wilo da elçîtiya xwe kî. Bi zimanekî diplomatîk gira xwe da der, verîşî, hevkariya xwe bi sazûmaniya tirk re da xuyan.

Ev mirov dibêje, ez 'mafî kurd diparêz-im' serokê partiyekê, welaparêz e, kurdhez e, azadîxwaz e, aşîxwaz, demokrat û hwd. hemû navan li xwe dike. Bi rastî wilo ye? Wilo tişte balkêş ci ye? Di qada navneteweyî de û bi taybetî li Ewrûpa tû hêzeke sîvî êrîşen leşkerî, şer napesinin, napejîrinin, hemû li dijî êrîşen leşkerî, li dijî bombebaran û li dijî çareseriya leşkerî ne. Di götinê de be jî kes an jî sazî û partî êrîşen wilo napejîrinin. Lî Şerâfetin Elçi hat li Ewrûpa civîn çekirin, daxuyanî dan, got mafî Artêşa Tirk heye operasyonê wilo bike û hwd. Bersiva van çawa tê dayîn û pêwist e çawa bê dayîn ez ji we re dihêlim.



**E**rebekî sertî, li herêma Xerzan çerçitî dikir. Her dema diçe herêma Xerzan li malekê dibe mêtvan. Çerçî û xwediyê malê ji hev re dibin heval û dost. Navê xwediyê malê Hepo bû. Hepo mirovekî dilpak û paqîj bû. Lê, nexwendî û nezan bû. Dostê dostê xwe, dijminê dijminê xwe bû. Mirovekî merd û ciwamêr bû.

Dostaniya wî û çerçî çend sala dom dike. Rojekê çerçî dîsa diçe herêma Xerzan û dibe mêtvanê Hepo.. Çerçî pişti ku nanê xwe dixwe dibêje; "Hevalê Hepo ez dixwazim ku tu jî werî mêtvantiya min. Ger tu werî ezê pir këfxwes bîbim." Hepo, li çerçî dizivire û bi devke-

nî dibêje: "Weleh ku rojekê riya min bi Sertê bikeve ez soz didime te, ezê werim mêtvantiya te." Pişti ku Hepo û çerçî xwarina xwe dixwin, çaya xwe vedixwin, çerçî vedigere Sertê.

Di vê navberê de sê çar meh derbas dibin. Rojekê kar û şixulê Hepo li Sertê derdikeye, Hepo diçe Sertê kar û şixulê xwe diqedîne. Paşê xwe bi xwe dibêje: "Lawo Hepo, ma heval û dostê te, yekî hêja li vir hebû, ma tu çawa lê napirsî?!" Pişti re biryar dide ku here mala hevalê xwe yê çerçî. Diçe li ber deriyê malê disekine, li derî dixe. Hevalê wî yê çerçî tê derî vedike, bi awirêne bêwate li Hepo dînihêre û dipirse: "Xêr e, tu kî yî, tu li

# Gundî û çerçî

çi digerî?" Hepo, matmayî dimîne û dibêje: "Mal xerab, ma tu min nas nakî, ez Hepoyê dostê te me."

Cerçî bi hêrs; "Ez te nas nakim tu kî yî, here karê xwe" Hepo dîsa dibêje: "Kuro çerçî mal xerab ma tu çawan min nas nakî, ez Hepo me. Ew qas sal dosta-niya me heye." Lê, çerçî dîsa xwe ji binî derdixe, bi dengekî bilind dibêje: "Tu hevalê min ên wisa tune ne, ez te nas na-kim." Dibêje û derî digire. Hepo dilşikestî û bi madekî tîrs, serê xwe xwar dike ji xwe re dibêje: "Ma heta niha kê xêr ji çerçîyan dîtiye, hevaltiya wan bi kêrî ci tê. Lê, Xweda mezîn e."

Sal zivirî demsal bû bihar. Çerçiyê ereb, dîsa fîraqê (eşya) çerçitîyê li ker û hespê xwe bar kir û ber bi Xerzan cûku çerçitîyê bike. Li Xerzan diçe mêt-vantiya Hepo. Hepo deriyê xwe lê vedi-ke, bi xizmet û hurmet rî dide wî, pişti ku xwarin vexwarin dest bi sohbetê ki-rin, di nava sohbetê de Hepo, bi awayekî sîtemkarî got: "Hevalê çerçî, îsal hîrj û bezar li zeviyâ min hatine xezebê. Ez diçim nêçîrê, lê, ez ji nêçîrê re ne jîr im. Nizanim ezê ci bikim". Çerçî bi awayekî bi xwe ewle dibêje: "Hevalê Hepo, ma ji vî tiştî rihetir ci heye. Ji xwe ez nêçîrvanekî jêhatî me. Fîsek a ku ez ber-

dim vala naçe." Pişti ku çerçî wisa got Hepo bersiv da û got: "Ê baş e, hevalê çerçî! Madem wisa ye, em êvarê herin ber zeviyê nobedariyê." Pişti ku hînekî din sohbet kirin Hepo bi mana destmîj girtinê derdikeye derve diçe ba jina xwe û dibêje: "Binêre hurmet dema ku ez û çerçî cûn nobedariya zeviyê ku hînekî wext derbas bû tu kerê çerçî bera nav ze-viyê bide."

Pişti ku tariyê xwe berda erdê, çerçî û Hepo cûn ber zeviyê nobedariyê. Jina Hepo li pey wan cû dawîya zeviyê û ker bera nav zeviyê da. Dema xişe xişa ker tê, Hepo, bi piste pist ji çerçî re dibêje: "De hevalê çerçî, xwe amade bike hat." Çerçî berê çîftê da cihê ku deng jê tê û sekînî. Pasê, Hepo got: "De çerçî nese-kine, de berde." Çerçî got: "Ya bismila û du derb li ser hev bera kerê dan. Pişti ku bi bazdan ew ber bi berata kerê cûn, fam kir ku kerê xwe kuştîye. Bi xemgînî û girî got: "Heywax hevalê Hepo, min bi destê xwe mala xwe şewitand."

Hepo got: "Hey dostê qelp û sexte, hey nankorê nankor tu li ber deriyê xwe dostê xwe nas nakî, li nav zeviyê jî kerê xwe nas nakî." De rabe lez bike bicehi-me. Tu bi ku ve diçî, biçê."

i. TEKDEMİR – M. GÖKÇE

## BIXELAT...

## XACEPIRSA BIXELAT (77)

## XACEPIRSA

Jîn Scheddeke kered nemînî	P	Astrologî Scheddeke	F	Rû turke Bundî Rûbundî Cînawî	A	Zîn heşpî ba tîrî Cînawî	E	Rû turke heşpî awetî Pîshî	S	Turke semedî neşîne yînî
Z	T	L	N	Z	E	Y	N	E	P	
R	A	L	T	Z	E	R	T	N		
X	E	W	L	E	R	G	S			
K	I	N	Q	E	D	T	O			
C	K	A	S	Q	A	S	O			
A	B	R	O							
E	R	H	N							
A	J	O	A							
E	M	N	A							

PEYVA VEŞARI → CİWAN HACO

Bersiva Xacepirsa 75'an

Xacepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 77'an Kaseta Ciwan Haco (Bilûra min) e

Jérénöt:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava quityên li bin xacepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe jî me re bişînin.



Pênc kesen ku xelata xacepirsa me ya hejmara 75'an pirtûka 'Ziwanê ma' qezenc kirine. Ömer Tavukçu/ Amed, Jîyan Ronîzî/ Batman, Emin Azîk/ Batman, Mahmut Cengiz/ İskenderun, Mehmet Cihan/ Konya

Agahî	↓	Amûreke ritmê	↓	Kesê kirêt	↓	Irani	↓	Kesê ji mûradîyê	↓	Serxwaz
Şehîdek (wêne)		Cinavkek				Üdjén				
3						5				1
Lêv	→	6		Êdi	→					
Qeymax	→	(berevajî) weldî	→	Zeng, pas	→					
		Nanpej		Sembola mag-nezyûmê						
Bermalî	→		↓			7	Tîstê şewl-tandinê			
Gihanekek	↓	Çlyayek (berêpas) meşrû	→	2			Av			
Mam	→		↓	Rû, cihê ku av naçe ser						
Ava laşê mîrov	→						Qertafa rewayê ya fermanî			
(berêpas) Misbet	→	8								
Agır	→			Tipek	→	Çavkani				

PEYVA VEŞARI →

1 2 3 4 5 6 7 8



## HADEP: Bi hatina hikûmeta nû jî pest û kotekî kêm nebûn

**P**artiya Demokrasiya Gel (HADEP), roj 17'ê tîrmehê der barê pest û kotekî yên dewletê yên li ser rayedar û endamên rîxistinê demokratik de daxuyaniyek da. Daxuyaniya ku ji hêla Cigirê Sekreterê Gişî yê HADEP'ê Aziz Doğan ve hatiye dayîn, li ser çend bûyerên rojêñ dawîn radiweste.

Di destpêka daxuyaniyê de tê gotin ku li Tirkîyeyê pirsgirêkên civakî, siyâsî, aborî li benda çareseriyê ne. Sedema çareser nebûna wan arîşeyan, çaresernebûna kêşeya kurdiye. Di daxuyaniyê de HADEP balê dikişine ser helwesta hikûmeta nû û dibêje ku divê koalisyonâ ANASOL-D dev ji îhlalîn ku hikûmeta Refahyol dikir berde û hin ga-vêñ erêni biavêje. Li gorî daxuyaniya ni-vîskî ya HADEP'ê îhlalîn mafêñ mirovan ên ku di 6-7 rojêñ dawîn de li ser gel û endamên partiya wan pêk hatine ev in: Roja 1'ê tîrmeh 1997'an rayedarê HADEP'a Batmanê Bedrettin Topkan û birayê wî Ahmet Topkan li gundê bi navê Zaxora (Kesmeköprü) bi şev saet di 23'yan de ji hêla 4 kesan (yek ji wan jin bû) ve ku kîncêñ gerîla li wan bûye, hatine revandin. Çavdêren bûyerê diyar dikin ku du kesen ku hatine binçavkirin li derveyî, li panzera leskerî û mînibûseke spî hatine siwarkirin. Malbata Topkan û HADEP'a Batmanê serî li sazi-

yên dewletê dane, lê heta vê gavê tu encam bi dest nexistine. Pişti vê serilêdanê îcar ji Navenda Gişî ya HADEP'ê serî li wezareta karê hundirîn, walîtiya herêmî û waliya Batmanê da, lewre ji pişti demekê ji bûroya rîveberiya taybetî agahiyeck tê ku Bedrettin Topkan û Ahmet Topkan li Qose-ra Mêrdinê di binçav de ne.

Her wiha deh roj berê (7 tîrmeh) Sekreterê HADEP'a Geverê Hasan Mert hatibû binçavkirin, lê hatibû berdan. Ev sê roj in ku Hasan Mert disa xistine binçav. Li Tatvanê Sekreterê HADEP'a Pendikê Alatîn Altıntaş, birayê wî Abdullah Altıntaş û muxtarê gundê Sögütlü'ya Tatwan'ê hatine binçavkirin.

Roja 2'ê tîrmeha 97'an, hêzên dewletê avêtine ser gundê Hisaraltıya Dêrikê û 34 kes xistine binçav. Yek ji wan ji ber-işkenciyêñ giran felç bûye. HADEP di ser vê bûyerê dide zanîn ku, Mêrdin ne di nav sînorê Rêwsa Awarte (Olağanüstü Hal) de ye, lewre ji divê binçavkirin heri zehf 5 roj be, lê mixabin ew 34 kes demeke dirêj e ku

di binçav de ne. Li gorî zagonê CMUK'ê li wê derê hiqûq binpê dibe. Ji kesen di bin çav de yên ku navêñ wan diyar bûne ev in: Ömer Söylemez, Ferhat Söylemez, Deham Söylemez, Savaş Söylemez, Bilal Aslan, Murat Ates û Sıddık Aksin.

Roja 15'ê tîrmehê nîvê şevê malen Serokê HADEP'a Célé Salih İrem û rayedarê HADEP'a Culemîrgê Mustafa Tan û Bedirhan Koç ji hêla tîmîn taybet ve hate serobinkirin. Di mal de le-qayı lêdan, dijûn û gefan hatine. Dîsa Ahmet Mavigözê ku li PTT'ya Culemîrgê dişixule, dema serê sibê diçe ser karê xwe (roja 16'ê tîrmehê) ji hêla polisan ve tê gulebaran-

kirin. Mavigöz bi awayekî xedar birfindar bûye û ew rakirine nexweşxaneyê. Her wiha HADEP dide zanîn ku li ser rayedar, dilkwaz'û endamên wan tehdîta mirinê didome, lê ewê tu car dev ji doza aştî, azadî û demokrasiyê bernedin.

NAVENDA NÜÇEYAN



## Ferhengok

**debara xwe kirin:** idareya xwe kirin  
**desthilatdar:** serdest (egemen)  
**erêni:** pozitif (olumlu)  
**faşkirin:** ferşkirin, rezîlîkirin  
**gedek:** zarok, mindal, sebî, biçûk  
**gêrik:** mûri, gêre (karinca)  
**girse:** cemawer (kitle)  
**hevkeş:** hemteraz (denge)  
**kevnêşopî:** toreyî (geleneksel)

**mebest:** niyet, meram  
**navnobûn:** navderketin  
**paşgo:** ilave  
**paxav:** hesibandin  
**pesendîkirin:** tesdiqkirin (onaylamak)  
**pêdîvi:** pêwîstî, ihtiyâç  
**sareza:** pispor, zorzanâ (uzman)  
**serpeze:** belengaz, reben, perişan  
**tekûz:** bêkêmasî, komple  
**watedar:** manîdar (anlamlı)  
**zanîstî:** zanyarî, ilmî  
**xûgi:** bertfil

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gefnendeyê Weşanê  
(Yayin Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karê  
Nîvîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALÎH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHÎR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Gişî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbat

Tel: 00 32  
53 64 12 62  
Brûksel  
Medenî Ferho  
Suriye:  
Jan Dost  
Helîm Yûsîv  
Berlin:  
Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selîm Biçük  
49-5721-81360  
Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884  
Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564  
Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

**aborzan:** ekonomist  
**afîfîner:** xulqîner (yaratıcı)  
**alav:** navgîn, hacet, vasita  
**ast:** sewîye  
**bawername:** destûrname, diploma  
**bîfermînîn:** kerem bikin, emir bikin  
**behicîn:** acîzbûn, zîverbûn, tengijîn  
**berbû:** berbûk (düğün alayı)  
**berêvajîkirin:** tahrîfîkirin  
**bêdadî:** needil  
**dabas:** mijar, babet, mewzû  
**daxwazname:** arzuhal (dilekçe)

# E her tim di bin çav de ne

Cengiz İnce: "Ev yek pirsgirêkeke gişî ye, ne tenê li Stenbolê li her cihê Tirkîyeyê ev ênşen li ser esnaf, hunermand rewşenbir û rojnamevanan û hwd. tê kirin. Wexta li hesabê wan tê, tişteki malbêjin, lê ku ketim tengasiyê wekî gelek tiştên qirêji ku dikin, bi ser me de jî tê. Gava me dixin binçav, dibêjin: 'hûn endamên PKK'ê ne, hûn alikariya PKK'ê dikin.'

**P**işti rapora MGK'ê gelek biryarêni siyasi li dijî civaka kurd hatin standin. Bi van biryarêni siyasi daxwaz û armanca dewletê ewe ku, çalakiyên kurdan ên wekî çand û hunerî û hwd. bêñ astengkirin. Bi talîmata serokwezîr, kurdêni ku ji ber zordestiyê ji cih û warê xwe koçî bajarêni mezin kirine, ji hêla wezira karê hundurîn ve wekî sûcdarêni potansiyel tênişandan. Di giştînameya (genelge) veşarî de ya bi sernavê "1997 PKK faaliyetlerine karşı önlemler (bergiriyên li dijî çalakiyên PKK'ê yên 1997'an)" her tişt bi awayekî zelal tê nişandayîn. Tê fêmkirin ku civîn û brîsingêni artêş û hikûmetê ji kurdan re ne xêr in. Her wiha dewleta ku her dem li metrepolan û bajarêni Kurdistanê bi awayekî tûj bi ser gel de diçe, bi van biryarêni xwe yên dawî jî, bêhtir bi ser gel de diçe.


Di giştînameyê de bi giştî li ser dezgehdar û esnafê kurd hatiye rawestin û hatiye daxuyandin ku dezgehdarêni bajarêni wekî, Stenbol, İzmir, Enqere, Edene, Antalya, Konya, İçel, Nevşehir û hwd. PKK'ê ji aliye aborî ve finanse dikin, divê rî li ber wan bê girtin.

## Giştînameya ku hate belavkirin

Ji aliye wezareta karê hundurîn ve giştînameya veşarî li nêzîki 80'ê bajarî hat belavkirin. Pişti ku ev giştînameya veşarî ji Walîyê OHAL'ê, Fermandarıya Giştî ya Cendirmeyan û li Midiriyeta Emniyetê belav bû, li Stenbol û İzmirê bi dest êrişen xwe yên li dijî dezgehdarêni kurd kirin. Bi giştî kurdêni ku ji ber ser reviyane hatine metrepolan debara xwe bi vî katî dikin. Di van êrişan de nêzîki 300 mirov xistin bin çav û dest danîn ser erebeyen wan. Tevî polisan, zabiteyêni belediyeyê ji vê operasyona li hemberî dezgehdaran dimeşinîn.

## Fermana Operasyonê

Pişti ku fermana operasyonê hate dayîn, li gelek cihêni Stenbolê wekî Eminönü, Beyazıt, Laleli û Yenikapı dest bi komkirina dezgehdaran kirin, di vê berhevkinê de polis û dezgehdar car caran bi hev ketin. Gelek dezgehdarêni kurd vê operasyona li dijî xwe şermezâr dikin û wiha dibêjin: "Ev ope-



1993'yan

Ev giştînameya ku di dema 3.1.1997'an de hate belavkirin, dûmâhîka biryara ku di sala 1993'yan de hatibû standin e. Ev genelge ji aliye wezareta karê hundurîn ve hatiye amadekirin li ser fermana serokwezîr. Di genelgeyê de esasê ku li ser diseokinin jî, "PKK li metrepolan bi zêdê pêş dikeve, PKK bingeha xwe bi vî awayî li bajaran ji xurt dike, divê kurdêni ku li bajaran mezin civiyane bêñ kontrolkirin." Biryareke ku di vê giştînameyê de cih girtibû jî li ser qursen zimanê kurdî bû. Di giştînameyê de qedexekirina qursan dihat xwestin, li ser vê daxwazê polisan di ser hinek saziyên çandî hunerî û rî li

rasyon li dijî kurdêni ku ji Kurdistanê hatine û xwe li vir bi cih kirine ye, her çiqas bibêjin dezgehdar ji dora me dilewîtinin an jî pergala bajêr xira dikin, ne wisa ye, daxwaza wan ew e ku di ençama operasyone, de me ji van deran dûr bixin."

Tê xuyan ku dewlet kurdêni li metrepolan ji rehet bernade. Tevî van êrişan, sedema ku tê nişandayîn, sedema ku di giştînameyê de hatiye nişandayîn eango "ev dezgehdar PKK'ê ji aliye aborî ve finanse dikin." Ev yek jî baş nişan dide ku polis û zabite daxwaza serokwezîr tînin cih.

## Giştînameya sala



ser çalakiyên wan ên ji bo fêrkirina zi-manê kurdî girtibûn.

## Dezgehdarêni Eminönü ji bo vê yekê ci dibêjin

Esnafen Emînönüyê jî ji vê operasyonê para xwe standin. Roja şemiyê 12'yê meha 7'an a 1997'an polis û zabiteyan dest danîn ser kinc û tiştên dezgehdarêni kurd ên li Eminönü, şes kes xistin binçav û amadehiya êrişike mezin kirin, lê nihertin ku çapemenî pê eleqedar dibe, dev jê berdan. Li ser vê yekê hin dezgehdar û esnafen Emînönüyê dîtin û ramanê xwe wiha anîn zi-man.

Cengiz İnce: "Ev yek pirsgirêkeke giştî ye, ne tenê li Stenbolê li her cihê Tirkîyeyê ev êriş li ser esnaf, hunermand rewşenbir û rojnamevanan û hwd. tê kirin. Wexta li hesabê wan tê, tişteki malbêjin, lê ku ketim tengasiyê wekî gelek tiştên qirêji ku dikin, bi ser me de jî tê. Gava me dixin binçav, 'hûn endamên PKK'ê ne, hûn alikariya PKK'ê dikin.' dibêjin. Ev ji bo dewletê mazeret e ku êrişî ser me bike. Bi piranî jî êrişen ku li Emînönü dîbin, bi tesra Serokê Belediyeya Navçeya Emînönüyê Ahmet Çetinsaya ye. Wî jî, berê li Kurdistanê sûbatî kiriye, û ji MHP'ê ye. Ji hinga ku ev însan bûye serokê belediyeyê, xwinê ji devê esnaf û dezgehdarêni kurd tîne. Emê jî ji vir pê de li dijî vê bêheqiyê çalakiyê xwe li dar bixin."

Her wiha İkbal Işık jî, li Emînönü kincan difiroşe, ew jî der barê vê bûye rî de wiha difikire: "Li hemberî vê yekê em jî nizanîn ku emê ci bikin. Ji hefteyekê du rojan, em di binçav de derbas dikin. Ji standina bertîlî bigirin, ci bêbîra we, wê dikin. Emniyet û zabita dîbin yek û têñ bi ser me de. Em vî tişti bir dîbin ku ev êriş û reziliya ku li ser me dikin, berhemâ biryaren siyasi ne. Em tev bi hev re tevdigerin. Kêşeya dezgehdaran divê bê çareserkirin, raya giştî jî divê li ser vê bûyerê bisekine, em jî li vê derê mafê xwe yê xebatê dixwazin." Her wiha kincifiroşen din jî, Osman Suvarî, Avnî û Behcet jî wekî Cengiz û İkbal difikirin û dibêjin "divê raya giştî li ser van neheqiyen ku li ser me têñ kirin, bisekine."